

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ

TÊZA LÎSANS A BILIND



Tevkarîya Sînemaya Kurdî Ji bo Edebiyata Kurdî

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

15950001079

VAN- 2019

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ

TÊZA LÎSANS A BILIND



Tevkarîya Sînemaya Kurdî Ji bo Edebiyata Kurdî

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

15950001079

Şewirmend

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN- 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRD DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ



Kürt Edebiyatının Kürt Sinemasına Katkısı

Hazırlayan

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

15950001079

Danışman

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN- 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Mohammed A. Abdulrahman ABDULRAHMAN tarafından hazırlanan "Tevkarîya Edebiyata Kurdî Ji bo Sînemaya Kurdî" adlı bu çalışma, 12/07/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.


Prof. Dr. Murat MİREL
Enstitü Müdürü


NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
SPAS Û PÊZANÎN JI BO	VI
KURTBÊJE	VII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEMÎN	5
1. DÎROKA SÎNEMAYÊ	5
1.1. Dîroka Sînemayê û Dirûstkirina Kameraya Sînemayî Li Cîhanê.....	5
1.1.1. Dirûstkirina Kamerayê.....	5
1.1.2. Destpêka Derketina Sînemayê	7
1.1.2.1. Sînemaya Emrîkayê:	8
1.1.2.3. Sînemaya Firansayê.....	12
1.1.3. Georges Mîlyes Û Têkiliya Wî Li Gel Sînemayê	16
1.1.4. Diristbuna Sînemaya Dengi	19
1.2. Dîroka Sînemaya Kurdî	20
1.2.1. Sînemaya Başûra Kurdistanê (Hevpeyvîn Li Gel Şaxewan Mistefa)Yê	23
1.2.1.1. Rêveberiya Sinemaya Kurdî Li Kurdistanê Başûr Kengî Dirustbû ye?... 25	
BEŞA DÛYEMÎN	27
2. PEYWENDÎYA SÎNEMAYÊ BÎ WÊJEYÊ RE	27
2.1. Peywendiya Sînemayê Bi Wêjeya Cîhanê Re.....	27
2.1.1. Kesên Yekemîn Ku Sînyaro Bo Sînemayê Afrand Û Ji Çiqên Edebî Sûd Wergirtine	28
2.1.2. Peyva Îqtîbasê (Wergirtin).....	33
2.1.3. Şêwaza Wegirtina (Îqtîbas) Daqên Edebî Bo Sînemayê.....	33
2.1.3.1 Wergirtina Azad	33
2.1.3.2. Wergirtina Bi Wefayî.....	34
2.1.3.3. Wergirtina Peyv Bi Peyv.....	35
2.1.4. Wergirtin Di Bingeha Çêj Û Tam A Dîtina Filman De Ji Aliyê Temaşevanan Ve.....	35
2.1.4.1. Wergirtina Veguhastinê.....	36
2.1.4.2. Wergirtina Ravekirinê	36
2.1.4.3. Wergirtina Berawurdî (Hemberkirin).....	37
2.1.5. Wergirtina Deqên Edebî Û Guhartin Bo Sînemayê.....	37

2.2. Sînama Û Edebiyata Kurdî	39
2.2.1 Peywendiya Sînemaya Kurdî Bi Edebiyata Kurdî re	40
2.2.2 Fîlmên Kurdî Ji Edebiyatê Kurdî Sûd Wergirtine? (Hevpeyvîn Li Gel Piştîwan Adullah)	41
2.2.3. Peywendiya Sînemaya kurdî Li Gel Çeşnên Edeba Kurdî	44
2.2.3.1. Roman	44
2.2.3.2. Çîrok	46
2.2.3.3. Şano(Tiyatro)	47
2.2.3.4. Dastan	48
2.2.3.5. Efsane	50
2.2.3.6. Helbest (Şi'ir)	51
2.2.2.7. Gotinên Pêşyan	51
ENCAM	53
ÇAVOKANÎ	55

KURTE

TÊZA LÎSANS A BILIND

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZÎNDÎ

TEMMUZ, 2019

TEVKARÎYA SÎNEMAYA KURDÎ JI BO EDEBIYATA KURDÎ

Di dema niha de, yek jî mijara herî girîng ya di dinyayê de, ku cîyekî girîng girtiye, rexnegir û nivîskarên Edeb û sînemayê, sûd wergirtina sînemayê ye ya di edebê de. Sînema di dinyayê di û her civakê de cîyekî gelek girîng girtiye. Piştî hatina sînemayê di demeke kurt de sînemayê feydeyeke xurt ji edebiyatê wergirtiye. Eger em berê xwe bidinê dîroka sînemaya cîhanê parê herî zêde ya sînemayê ye. Bi dîmen kirin û sûd wergirtina sînemayê ya ji roman û çîrok û deqên edebî ne. Di sînemaya Kurdî de jî gelek çîrok û deqên edebî, ji aliyên derhênerên kurd ve bûne film. Di xebatame me de kar ji ser vê peywendiya di navbera sînemaya kurdî û edebiyata Kurdî de hatine kirin, sînorê xebata me jî di kurdîstana başûr da ye, wan nûsîn û deqên edebî ku di Kurdîstana Başûr (Herêma Kurdistan) sûd lê hatîne wergirtin. Xebata me ji dû beşan pêk hatîye. Beşa yekem behsa dîroka sînema û a kamîraya sînemayê ye, ew jî berçav roniyeye ji bo xwînerê. Beşa duyem jî pevendiya sînema û edebiyatê û sûd wergirtina sînemaya Kurdî di edebiyata Kurdî da ye. Di destpêkê de jî me xwest ku bi kurtasî em li ser dîroka edebiyata Kurdî bisekinin.

Peyvên Sereke : Sînema, Sînemaya Kurdî, Edebyat û Sînema, Georges Melies, Sûd Wergirtina Sînemayê Ji Edebyatê.

Çend rupele : 57

Şêwirmend : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Temmuz, 2019

KÜRT EDEBİYATININ KÜRT SINEMASINA Katkısı

Günümüzde, sinema dünyası üzerine en önemli konularından biri, sinemanın edebiyattan alıntılarıdır. Bu sinemanın hitap ettiği her toplum için geçerlidir ve her senarist ve yönetmen için önemlidir. Edebiyat sinemaya uyarlandıktan sonra sinemanın kalitesi ve önemi arttı. Sinematografik dünyanın tarihini göstermek zorunda kalırsak, sinematografiyi romantizmden ve romantizmin hikayelerinden görmek mümkündür. Kürt edebiyatında hikayecilik, Kürt yönetmenleri tarafından sıkça başvurulan edebi alandır. Biz de bu çalışmamızda, her ne kadar dünya sineması ve edebiyatından bahsetmişsek de, asıl amacımız Federal Kürdistan'da (Irak Kürdistanı) yönetmen ve senaristlerin Kürt sineması ve edebiyatla ilişkisini ve Kürt sinemasına katkıları üzerindeki çalışmalara dikkat çekmek istedik. Bu alanda Kürt edebiyatından sinemaya uyarlanmış sayısız eser bulunmakta. Bunlardan bazıları başarısız olmasına rağmen, bazıları uluslararası alanda ödül de almıştır.

Tezin birinci bölümünde sinema ve sinemanın kameraya geçiş aşamasından, ikinci bölümde ise sinemanın edebiyatla ilişkisini ele almışız.

Anahtar kelimeler : Sinema, Kürd Sineması, Edebyat Ve Sinema, Georges Melies, Sinemada Edebi Alıntılar.

Sayfa Sayısı : 57

Tez Danışmanı : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

ABSTRACT

MASTER THESIS

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

July,2019

BENEFITS OF KURDISH LITERATURE TO KURDISH CINEMA

Nowadays one of the most important subjects in the world that has an important situation by the critics and literature writers is the literature`s benefits for the cinema. in the world in each culture cinema has It`s importance, After a short time of cinema`s appearance it could get a lot of advantages From the literature. If we look at the history of the cinema in the world most of the cinematic works used visualisation by using novels, stories and literary works. In the Kurdish cinema most of the stories and literature contexts are made films by Kurdish directors.In our research we focused on the relation between the Kurdish cinema and literature.Our limit is in southern Kurdistan those two Kurdish literature contexts had their benefits in southern Kurdistan for the purpose of making films .although our research contains two parts .The first part talks about the history of the cinema and making cinema cameras, For the readers understanding.The second part is the relation between cinema, literature and those who first used the scenario in the Cinema and the Kurdish literature benefits for Kurdish cinema.

In our research introduction we shortly talk about the history of Kurdish literature.

Key words : Cinema, Kurdish Cinema`s, Goerges Melies, The literature`s Benift For TheCinema, cinema And Literature.

Quantity of Page : 57

Sıpervisor : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

PÊŞGOTIN

Armanca min a vê xebatê ew e ku min xwast deqên Edebî yên ku li Kurdistan a Başûr bûne film bidim nîşandan ligel xebateke akademîk ku ez ê di heman demî de behsa pêwendiya di navbera sînema û wan deqên edebî bikim. Ez bawer bikim ku yekemîn car e wê qala vê pêwendiyê di xebateke bi vî rengî de were kirin helbet ev yek jî dê rê veke ku em karibin agahiyên baştir bigirin li ser edebiyat û dîroka sînemaya Kurdî. Bi giştî mirov dikare bibêje, em ê karibin bi vê xebata akademîk behsa hemû Janirên (cure) edebî bikin ku bûne sînyaro ji bo filmên sînemaya Kurdî.

Navê pêşniyaz a têzê

Bi Kurdî: **(Tevkarîya Sînemaya Kurdî Ji bo Edebiyata Kurdî)**

Bi Tirkî: **(Kürt Edebiyatının Kürt Sinemasına Katkısı)**

Bi Înglîzî: **(Benefits Of Kurdish Literature To Kurdish Cinema)**

Materyal û Rêbaz

Materyal û rêbaza têza me pêkhatiye ji ‘berhevkerin, vekolin û dîrok’

Girîngiya Pêşniyaza Têzê:

Girîngiya mijarekî ew e ku heta niha çî lêkolîn û xebat di wê mijarê de nehatine kirin, û li Kurdistan a Başûr gelek deqên edebî hatîne guhertin ji bo filma sînemayî, lê heya vê demê tu kesekî behsa vê mijarê nekiriye lê em ê behis bikin û bikolin, ji bo xwendekar û wan kesên ku dixwazin filman çêkin ku deqên edebî jî ji xwe re çavkanî dibînin û girîngiyê didin wêjeya Kurdî û dixwazin agahiyê ji rewşa sînemaya Kurdî bigirin bi taybet jî ji Kurdistan a Başûr.

Astengî û Pirsgirêkên Têzê

Bêguman ji bo amadekirin a her xebatekê ekademîk pêdivî gelek tiştan hene ku mirov rastê gelek astengiyan tê an jî mirov dialiqe bo nivisîn a xebateke baş. Ev arîşe bêguman gelek bûn ku bo me ya yekemîn an go arîşeya herî mezin tunebûna çavkaniyên di vî warî de bû. Ya duyemîn jî bidestxistina a çavkaniyên heyî bûn ku xwe gîhandina wan zehmetbûn. Lê her çiqas van yekan bo me arîşe derxistibin jî min hewl da ligel lêkolîneke baş tiştên baş binivîsim li ser mijara ku sekinî me.

Plana Têzê

Têza min ji dû beşên sereke pêkhatiye, beşa yekemîn dîrokiye Dîroka sînemaya cihanî û çawaniya peydabûna sînemayê û dîroka sînemayê kurdî bikim bi taybetî behsa ya Kurdistana Başûr. Di beşa duyê de jî ez ê behsa çawaniya sûd wergeritina sînemayê ji edebîyata cihanî û kesên ku bûne egerê dirustbûna wê peywendiyê bikim. Di heman beşê de behsa sûd wergeritina sînemaya Kurdî ji edebiyata kurdî dikim bi taybetî ya Kurdistana Başûr.

MOHAMMED ABDULLAH ABDULRAHMAN

VAN- 2019

SPAS Û PÊZANÎN JI BO

Xwedayê Mezin ku di temamkirina vekolîna min da hêz û şiyar da min.

Dayik û bavê min yê xwoşewîst û herwisa endamên malbata min ku palpişt bûn ji bo bi dumahî anîn a vê têzê.

Serokatîya Zanîngeha Van Yuzuncu Yilê, Beşa Ziman û Kiltura Kurdî, li bajarê Wanê yê Bakûrê Kurdistanê ku derfeta xwendin a bilind (master) ji bo min rexsand.

Birêz Doç. Dr. Nesîm Sönmez ku erka şewirmendîya vekolîna min girte ser stûyê xwe û di wî aliyê da rênîşandar ê min bû di lêkolîna min da.

Rêzdar M. Şaxewan Mistefa, ku mezintirîn alîkariya min kiriye. Ji bo berhevkirina vê têzê her wiha Nivîskar û sînemakar Piştîwan Abdullah.

Gelek Rêzdar Serhed Serhedî û Abdullah Yıldırım ên ku demên xwe terxankirin ji bo lêkolîna min.

Rêzdar mamosta Şeyda Anwer ku bi rêka madî û manewî alîkariya min kiriye.

Her wiha ji bo hemû kesên ku bûne eger bo bidawî anîna vê têza min.

KURTBÊJE

Weş : Weşanxane

R : Rûpel

Hwd : Her wekî din

D.G : Diroka Ragihandinê



DESTPÊK

Dest pêka dîrok a Ademîzad her zimanê ku hatiye peyda kirin bêguman gelek pêdivî bi demê re bûye heta ku di nav çar dîwarên malekî de maye. Manîn a wê jî dîsa hewceyê demeke dirêj ra hebûye. Piştê nakokî ket navbera Ademîzad gelek ji wan zimanan ber bi pûçbûnê ve çûn û hindêk jî ji wan man, Man a wan jî nayê wê maneyê ku ew zimanan gelek bi hêzbûn yan jî ew zimanan ne gelek desthilatdar bûbin.

Ew zimanên ku çûn, piştê ku demê ew hêran navnîşanên wan neman. Ew ên ku man jî di çarçoveya neteweyekî de man û wan neteweyan wisa kirin ku ew ziman bimîne. Ew zimanên ku mane jî ji ber ku neteweya wan ji neteweyên dîtir dûtir mane zimanê xwe parastine. Gelek ji wan jî di nav neteweyên cur bi cur bûne lê ji ber ku desthilatdariya wan hebûye zimanê xwe parastine. Xaleke dî ku bûye sedema mayîna zimanê her neteweyeke dî hebûna ‘Zana û Rûspîyên’ wan in, Zana û Rûspiyên wan bi nivîs û berhemên xwe bûne sedema manîn a zimanê xwe, gelek caran wan nivîsîna sûdya wê tunebuye bo manîn a Zimên, çimkî gelek caran hêzeke desthilatdartir hatiye bûye sedema navbirina netewe û ziman nivîsîn a wî jî. (Aladîn Scadî, Deqekanî Edebî Kurdî, Weş. Korî Zanyarrî Kurdî, Bê Çap, Bexda 1978, r.9)

Eşkereye ku mirov di serî de cîyekî jiyaye, bi zimanekî axiviye paşê belavbûye, dabeş bûye çiqên wê zêde bûne bi neçarî li dinyayê berbelav bûye. Di wê demê de jî dabeş bûye li ser çend kom û destkan her yek ji wan jî şewaz û zimanek bo xwe peyda kiriye. Zimanê Kurdî ji yek ji wan zimanan e ku ji mêj ve hebûye û hebûna xwe jî parastiye herçend di çendan rexên wê tûşî ji navçûnê bûye. Ji ber ku herwext rastê dijminên xwe tûşî şer hatiye. Belam ji ber dûrbûn a wî ya ji cîhanê û ji ber têkoşîn a bab û bapîrên wan ji navçûnê filitî ne.

Zane û Zimannasên Kurdî li ser wê bîrê ne ku zimanê kurdî yek ji wan zimanên Hîndo Ewropayî ye, û bîngeha zimanê kurdî zimanê Arî ye. Bi dîroka kevn a Hîndî zimanê Arî navê yekemîn netewe bûye ku bi wî zimanî axivîne û 2000 sal berî zayîne di cîyê xwe ber bi welatên dî wekî Hînd û Îran koç kirine û di wir de niştecih bûne. Di wê demê de zimanê wan hêdî hêdî guheriye. Belam li gor hindêk zaneyên Îranî cihê wan ê resen her Îran bûye û zimanê Medî û Persî ji wan peydabûye. Piştî ku demek li ser ra derbasbû her yek ji wan zimanan çend diyalek lê zêde bûne û rastê guherînan hatiye. (Zibeyr Bîlal Îsmayl, Tarîx El-Lûge El-Kirdye, Bê Çap, Weş. El-Mekteb El-Wetenîye Baxda 1977, r.19.)

Li gorî çavkaniyên dîrokî yê kevn di vê mintiqê de çend xet û nivîsîn hebûne. Mirov di serî de nekaribûye binivîse û xet ji bo nivîsînê nebûye, di van çavkaniyên berdest de ew dibêjine me ku dest pê kirina nivîsa mirovan di serî de zêde sanahî bûye, yekemîn nivîsîn û xetên mirovan bi resmê dest pê kiriye. Mabesta xwe di rêka wênesazîyê ve vegotiye,

belgeyên ji bo axaftinê nivîsîn a li ser sûrên Pîramîdên Misrê bi xetên hîyeroglofîk û hwd. Piştî van xetên di nava netewan de hêdî hêdî guheriyê alfabê bo wan xetan çêkirine. Li gorî dîroka kevn a zanayên Îranî û Hînd-Ewropayî di wê mintiqê de gelek xet hebûne û şûnwarên wan maye, li ser Taşer û Şaxan hatiye kolîn. naskirin. Zimanên di wê mintiqê de hebûne. Ziman û Xetên Bizmarî yan jî Persî, Xet û Zimanê Avestayî, Xet û Zimanê Pehlewî, Xet û Zimanê Soratî, Xet û Zimanê Êzîdî (D. Cemal Reşîd, Lêkolîneweyekî Zmanewanî Derbarey Wilatî Kurdewarî, Bê Çap, Weş. Dar El Hurye Lîltbahe, Bexdad1988, R: 113)

Ew tiştên ku me heta niha behsa wan kir, dest pêkek e bo dîroka nivîs, ziman û ew edebên ku ji berê de li vî welatî hebûne ku ev jî bûne rêça peydakirina dîroka kevnar a Wêjeya Kurdî. Dema em beşên berê dixwînin derdikeve holê ku Kurd û Edeba Kurdî ne ewqas tariye. Di dîroka wêjeyî ya cîhanê de mirov nikare behsa tarîbûna vê yekê bike. Ev jî bi temamî bi me dide xuya kirin ku wêjeya kurdî dikare hevsengiya xwe biparêze di nav dîroka edebiyata cîhanê herwiha dikare serê xwe berz bike li ber wêjeya cîhanê.

Yekemîn car pirtûka ku bi zimanê Kurdî hatiye nivîsîn ji aliyê Zerdeşt ve bûye ku bi navê xwe Avesta ye ev jî pirtûkeke olî bûye ku dikare bi serê xwe bibe bigeha wêjeya kurdî. Pirtûkên ramyarî, bedensaxî, dîrokî, wêjeyî, efsaneyî, çîrok, cotkarî, estêrannasî di zimanê Pehlewî de hene. Her wekî me berê jî diyar kiribû zimanê Pehlewî nêzê zaraveyên kurdîne wek ‘‘Lorî, Goranî, Lekî’’. Ji bilî van zareveyan, peywendiyê xurt di navbera zaraveyên di de jî heye. Li derveyî Avesatayê kitêbên di yên olî ên Kurdan xwêdî giringiyêke bêhempa ne di wêjeya kurdî de. Di pirtûka ‘‘Serencam’’ de behsa Xesrew Perwêz hatiye kirin ku Xesrew di salên 590-627ê mîladê bi deng û awazên xwe helbestên Kurdî bi tembûra xwe lê xistiye û her ew bû yê ku awaza Kurdî afirandî. (Sîdîq Borekey, Mêjûy Wêjey Kurdî, r.28)

Wekî bi awayekî şênber xuya ye, dîn û baweriyên pêxember û zanyarên Kurdan bandora xwe li ser çand, huner û wêjeya gelê Kurd kirine, hiştine ku ziman û wêjeya Kurdî li ser şunewarên xwe bimîne û wînda nebe, her wiha wan bi vê heyîn û ronahiya xwe ya resenî çand û wêjeya gelê Kurd ewşen kirine û li ser piyan hiştin. Bêguman em nikarin bibêjin ku gelek lêkolîn li ser wêjeya Kurdî hatine kirin çimkî kêmasiya nivîsê vê bi derdixê holê. Heger em behsa edebiyata kurdî bikin di meydana de ji çend pirtûk û gotaran zêdetir titştekin nîne yên heyî jî gelek kêmasî tê de hene ku em nikarin bêjin lêkolîneke zanistî û akademîk e. Neteweya Kurd xwêdî gencineyêke(xezîne) mezina folklor û edebiyata klasîk e ku edebiyata kurdiya nûjen jî pêşveçûna xwe her didomîne.

Zimanê Kurdî jî yek ji wan zimanê kevnarê Hînd-Ewropiyê lê belê gelek lêkolînên akademîk û zanistî di derheqê wê de nehatine kirin. Çawa dîroka kurdî tarîbû, edebiyata wê jî ji vê bêpar nemaye û ew jî di tariyê de maye. Her desthilatdariyekbo qewmê xwe xebitiye ku

jê mabest zindî girtina edebiyata qewmê xwe bûye. Ew edebiyata ku ji bav û kalan maye bi devkî gêhişte me ku bi demê re li ser kaxizan hate nivîsîn. Belam edebiya Kurdî niha jî wek halê xwe yê berê ye. Ew tiştên ku bûne sedema pêşveçûyîna edeba her netewên dî, di edebiyata Kurdî de jî hebûna, çi gumaneke edebiyata Kurdî nedima ku bibe yek ji edebên berz ê cîhanî. Eger em berê xwe bidine çiq û beşên edebiyata Kurdî heqê me heye em behs bikin. Çimkî edeb bi kurtasî dastana rabirduyan e, ji gotinên pêşiyar, helbestên helbestkaran, ji destgirtên detsrengînan, ji karê karzanan, pêkhatiye her yek ji wan mileke netewekiye. Neberhevkirina wan nayê wê wateyê ku kurd ji wan bêpar in. Ev tişt bi me dide zanîn ku perdeya demê yan zilma zordaran dem nedane em bifikirin ku wan berhev bikin. Ev jî nayê wê wateyê de ku di nav kurdan de jî kesên xwedî edebeke mezin tune bûn. Ev jî nayê wê wateyê de ku di nav kurdan de jî kesên xwedî edebeke mezin tune bûn. (Eladîn Sucadî, Mêjuy Edebî Kurdî, r.118)

Ger em bixwazin wêne li ser wêjar bikin di curên (beş) wêjeyê de ev yek bi bingeha janirên wêjeyî tê dayin ku di şanoyê de beşeke girîng têde pêktîne, her wiha ji çîrok û roman jî giringtir û bi bandortir paja wêjeyê ye û ji wê romanê jî giringtir e ku ji bo sînemayê tê nivîsandin, ji bo sazkirina wêneyeka wêjeyî pêwîstiya me bi sedan peyvên hene ji bo ku ew wêneya wêjeyî ku em dixwazin nîşanbidin da ku yên ku em dixwazin bi baştirîn şewaz bigehînin xwendevan an, di wêjeyê de jî sudeka baş ji hunerê şibhanî(wek wê) tê wergirtin, da ku ew wêneyên ku em dixwazin di hişê xwîner de saz bikin, bimîne, di nivîsê de berê xwe didin xeyal ji bo sazkirina wêneyeka wiha ku bişibe rastiye, lê em dikarin hunera sînemayê bi rêya nîşandanê an wêne an pajên taybet a sînemayê ku hene di lîvên karakter û nîşandana wêneyên rastîne û rastîneya rengên ku hene û b'kar anîna wan di cihên xwe de, bi awayekî teknîkî, sînemayî û wêjekarên taybet a sînemayê ku dîrin, ji van wêjekarên ku di pajên wêjeyî de hene, bedewtirîn wêne bînan nîşandan û zêdetir bişibihe wêneyên rastîne. Herwiha eger em bixwazin li gorî vê filîmê xeyalan bikin. Lê gerek hûrtir û baldartir behsa vê pêwendiyên di navbera sînema û wêjeyê de bikin, wekî ku li jor jî me behs kir pêwendiya sînema bi wêjeyê re pêwendiyeka b'hêz e, lê gelek nerînên cuda jî hene li ser sînemayê, gelek hîzr hene li ser vê yekê ku van filîmên dirêj vedigerine deqên wêjeyî an roman an çîrokan, em bi zelalî bandora wêjeyê li ser sînemayê dibînin û bandorên wêjeyê bi destpêk a sînemayê re xuya ye, lê hinek ji pisporên vê warî sînemaya xweser dibînin û li dijî vê yekê ne ku wêje bandora wê hebe bi ser sînemayê, lê ev tenê nerîneke, (Firînd Luncîye) wiha dibîne ku di pêşerojê de sînema wênegirtin û derhênana taybet b'xwe hebin, lê madem çavkaniya wê ji wêje û şanoyê re ye, angû sînemaya taybet tune, ji aliyekî din jî (Pol Falîrî) wiha dibîne: em dixwazin behsa nivîseka taybet bi hunerê sînemayê re bikin an sînemayek tenê ji alavên sînemayê çêbûbin, lê ku hemû bi hev re tê girêdan êdî hunerên şanoyê û romanê dibin kosp û astengî li hemberê vê, angû: sînema nikane bê wêje

BEŞA YEKEMÎN

1. DÎROKA SÎNEMAYÊ

1.1. Dîroka Sînemayê û Dirûstkirina Kameraya Sînemayî Li Cîhanê

Sînemayeke li hunerên ku xoşdiviyeka berfireh di nav civakê heye ,livîna(lîstin) wêneya ser perdeya sînemayê temaşavana gel xwe dibe cîhaneke din, ev livîna wêneyan serbarê cuda di navbera rastî û xeyalê de heye, lê gelek baş têtê pêşwazî kirin.

Sînema bi hunerê heftê têtê hejmartin, ji ber ku piştî awakarî, wênekêşî, şano, wênekar, mûzîk, reqs peydabû û ji van hunera pêkhat, ji aliyekî dî ev huner ji bilî afirandina hizirên sînemayî pêdivî bi amûreyên sînemayê heye mîna kamera,deng û tiştên ku li afrandina filîmekê pêdivî pê hene. Em dikarin bêjin sînema dikare ev hunere rinde hergav bervepêş diçe û têtê guherandin, di gel hemî van pêşveçûna û rindbûna xwe, tiştêk nîne ji rastiye tenê komeka wêne wek hevîn ku ‘reş û spî’ an jî (rengdar)in ku bi heraketeka diyarîkirî (24) wêneya li yek saniye de bi amûreyekê ku navê wî (projektor)e, wêney n di nav da diavête ser perdeyekê taybet ku temaşavan dikarin wan wêneyan bi awayekî herakî(bi livîn) bibînin, ev wêneyên cîgir ji ber mayîna kartêkirina ronahî li ser çavê temaşevanan bi awayekê hejîk û hereket dihête pêş çav, bi vî awayî, bi şêweyê rastî û hereket dihate dîtin, qeydkirin pêşandana wan wêneyan tevlihev dibin di gel dengê wî.

Di rastiye de diyardeya sînemayê çiqas bi navê biraderên Lomyer hatibe zanîn jî ew nayê wê wateyê ku herdû birader dest pêkin bo afrîneriya sînemayê. Belkî çêbûna sînemayê peywendiyê rasterast hebûye bi her şeş hunerên beriya xwe û em berê xwe bidine dîrokê ku mirov li cîhanê çêbûn ku di wê demê de ewilî di şikeftan de dijîyan wan mirovên wê demê li ser şikeft û kevîran wêne xêz dikirin. Hêdî hêdî ev huner bi rêya bîrmend û wênesazên binavûdeng pêşket. Piştî van hewldanên di vî warî de geşedanek çêbû bo fikrên fotografîyê ango wênesaziyê. Ev fikrên ku geşedanek çêkirin bûne sedem bo çê kirina Kamerayê ku ev jî bû rê ji bo çêkirina sînemayê. Piştî van gotinan mirov dikare bibêje ku sînema hewl û têkoşîna hezaran bîrmend û navdaran e ku beriya hezaran salan afiriye. (Teha Kermî,Sînemafîk,Çapa yekem,Weş. Serdem, Slêmanî 2013,r.18)

1.1.1. Dirûstkirina Kamerayê

Di sedsala 16ê zayîne de wênesazê gewrê yê mezin ê Îtalî Lonardo Davînsî ji bo perwerde kirina xêz kirina wêneyan jûrek çêkir ku ew jî wekî dayîka tomarkirina wêneyan têtê zanîn. Davînsî ji bo bala xwendekarên xwe bikêşîne, bi şêweya ‘‘Perspektîfê’’ wêne saz dikir

û jûrek çêkir ku mirov dişiya ji ciyekî bo ciyekî din bibe. Her wiha ev jûr ewqas mezin bû ku wênesazek dikaribû bi riheî di tê de bixebite. Li rûyê dîwarê wê jûrê jî şibakeyek çêkiribû tiştê ku tu bixwazî wêneya wê saz bikî we datîni li hember wê şibakeyê daku siya wê çê bibe di nav odeya wê jûrê de. Vê jî rê vedikir bo xwendekarên wî bi hêsanî karibûn karê wênesaziyê fêr bibin. Davînşî digotê wê jûrê kamîreya ‘‘Obsûkûra’’ yan jî digotê de Jûra Tarî. . (Robirt Culid Êtir & Marko Tirîffîs, El-fem ûel-fenanûn, Tircme D. Mistefa El-Sawy el-cuynî, ,Bê Çap, Weş: Mtbh el-Heyet El-Misrye El-‘Ame Lîlkitab, El-Eskenderye 1997, R:42-43)

Piştê wê sala 1550ê zayînê zanayekî din bi navê Cîrû Lamokar Dano Lensek danî li ser kûnê Jûra Tari ya Davînşî wê temam kir ku ev jî bû sedema wê yekê ku wêne zelaltir û ronaktir bûbe. Paşê ev amûre ji hêla hin kesan ve hate piçûk kirin lê hêj jî di nav wê jûra tarî ya Davînşî de bû. Heta çêkirina Kamîreya Wêneritînê ev amûre hate bikar anîn. (Gîta Girkanî ,Mêjûy Sînema, Wergêr: Sitar Kerîm, Bê Çap, Weş: Serdem ,Silêmanî 2002, r.5-6)

Yek ji wan egeran bo çêkirina kamerayê, vedîtina (keşf) xapandina çav e. Diyardeya xapandina çav sala 1834an de ji aliyê Peter Mark Rogt hatiye dîtin. Xapandina çav yan jî heyama wêneya di çav de 1/5 deqe ye. Bi wateyêke din eger mirov wêneyekî bide ber çavê yekî û careke din wê wêneyê rake ji bo demê 1/5 heta 1/20 xuleqan de di bîra çav de dimîne. Heke me 16 wêne hebin û her yek ji wan wêneyan kêr cudayî di navbera wan de hebe bi lez berçavê însanan derbas bibe wê demê mirov wêneyê wekî wêneyeke livîndar (culedar) dibîne. (Georges Sadol, Tarîx El-Sînema Fî El-‘Alem, Wergêr: Îbrahîm El-Geylanî Ê Fayiz Kim Niqş, Çapa Yekemîn, Weş. Minşûrat ‘Eyun, Beyrut 1965, r.17) ((Gîta Girkanî ,Mêjûy Sînema, r.7)

Mînak heke 16 wêneyên zarokê hebin di wêneya yekem de destê zarokî li ser serê wî be û di wêneyên din de destê zarokî hêdî hêdî ber bi jêr dakeve heta xwarê heke ew her şanzdeh wêne bi lez berçavên me re derbas bibin wê demê em ê zarokê dibînin bi şêweyêke livekî destê xwe tîne xwarê. Dî rastiyê de ev livînên ku em dibînin livînên xiyalî ne û cuda ne jî livînên rastî. Piştî vê yekê yek ji pisporên fizîkê (Josîv Plato) yê Belçîkayî û Sîmon Îştampifêr endezyarê Nemsayî (Awistîrya) her yekî jî serbixwe piştgiriya (xapandina çavê) kir û amûrek çêkirin ji bo dîtina Livîna xapandina çav ê. Navê wê amûreyê ‘‘Fînekîstoskop’’ bû. Ev amûre ji komek wêneyên xêzkirî pêk dihat ku ev wêne li ser şîrîteke kaxizê lûleyî bûn ku li derdorê xwe dizivîrî. Ev jî dibû sedema wê yekê ku mirov bikaribe wan wêneyan bi awayekî livîn bibîne. Ev amûre wekî pêlîstokekê li bazaran dihate firotin. (Teha Kermî, Sînemafîk, Rû:20) Piştî wê Joseph Nicephor Niepce sala 1822an de yekem wêneya fotografîk kêşand. Ji bo kêşandina wê wêneyê 8 saet ronahî pêwîst bû heta ku maddeya wê wêneyê bersiva wê wêneyê bidet. Rêjeya kêr kirina ronahî dayînê pêdivî çend mercekên din

bû pêşveçûnê. Sala 1839an de Henry Fax Talbot şiya kaxiza negatîvî biafirîne. Di wê demê de çap kirina wêneya li ser Slaytê hate vedîtîn bi alikariya Çiraya Fanûsê.(Se'yd Şîmî, El-Sure El-Sînemaeye Mîn El-Sînema El-Samite Ela El-Reqemya,Çapa Yekamîn, Weş.El-Heyet El-'ama El-Qsur El-Sînemaeye, El-Qahîre 2013, r.20)

Belam heta 1878an dema ronahî xistinê ji xulekekî nehate xwarê. (Teha Kermî,Sînematîk,R:20). Di sala 1888an de "George Istman" şiya kamerayekî biafirîne ku ev kamera bikaribe wêneya li ser rûloyên kaxizên hestiyar bigire ango bikêşe. Navê kameraya wî Kodak bû. Ji bo ku kamera ji qod û bendan rizgar bibe bibe karekî hêsan piştî wê salekê dîsa "Istman" rûloya "Siloloyîdî" dît. Ev jî pêngavek bo nêzîkbûna sînemayê. Yek ji wan mercan ku bûye sedema diristbûna sînemayê vedîtina mekanîzmaya şirîta hestiyar ya siloloyîdî bû ku dişiya ji xulekekî kêmtir çend car biliive û biweste. Mesela yek "Frame" dête pêşçavê kamerayê di wê demê de Şeter rê dide ku ronahî bikeve li ser madda hestiyara siloloyîdî careke din şeter rêya ronahiyê digire û di heman demê de Frameke din dihêt berçavê kamerayê êdî ev her dubare dibe ji deqeyekî kêmtir. Du kesên din ku vî warî de cihê destê wan diyar e Edward May Bradîje û Eteme Jules Marey bûn. Herduyan jî ji hez tomarkirina livîna ajalayan bûn. (Teha Kermî,Sînematîk,Rû:21;) Wênegirê Amerîkî Edward di sala 1888an de bi alikariya 13 kamereyan li hemerî yek wêneya qonaxa bizîna hespan girt. Ev kar jî ji bo nasîna livîna hespan bû ku pêşniyaziya parêzgera kalîforniyayê encam de. May Biradije nîvxulekê carekî şiya wêneya wan hespên ku dibezîyan bigire. Piştî wê vî wênegirî wêneyên hezaran ajalayan tomar kir û bû kesê yekemîn ku livîn û rûniştina giyangan an jî ajeleyan tomar kir. (Georges Sadol,TarîxEel-Sînema Fî El-'Alem,r.21)

Di sala 1881î de pêşangehek ji bo May Bradîje hatibû saz kirin wêneyên wî bi amûreyekî hatibû nîşandan li ser rûyê perdeyeke ku jê re digotin Emîl Rînû. Wêneyên wî li dû hev hatibûn danîn ku du navbera wan de demek hebû dema ku wêne diket li ser perdê wisa hîst dihate kirin ku ew wêne dilivin. Sala 1882an de Eteme Jules Marey yê Frensî ji bona heman armancê ango ji bo kêşandina wêneyên ajeleyan kamerayek çê kir navê kamerayê Tivinga Wênegirtinê ye. Ev kamera wekî tivinga bû di deqekî de dişiya danzêh wêneyan bigire. Bi vî amûreyê ve Fîrîna Balindeyan digirt. (Gîta Girkanî ,Mêjûy sînema,r.9)

Heke em beriya 1895an de bimînin gelek kesên din hebûne ku di vî warî de gelek xebat kirine. Her yekî ji xwe re pêngavek avêtiye bo pêşxistina diristbûna sînemayê.


1.1.2. Destpêka Derketina Sînemayê

Jidayîkbûna sînemayê girêdayê çavkaniyekî nîne. Sînema berhema şoreşa pîşesaziya rojavayê bû. Her çar welatên ewropî: Emrîkî, Frensî, Birîtanî û Elmanî cihê derketina sînemayê ne. Sê welatan: Emrîkî, Frensî û Birîtanî hewleke hêja dan bo sînemayê biafirîn û her sêyan di heman salî de berhemên xwe pêşkeş kir.

1.1.2.1. Sînemaya Emrîkayê:


Yekemîn kesê Emrîkî ku dest avêta karê sînemayê ku serkeftî bû ‘‘Kîlmen Silirz’’ bû. Wî sala 1861an de dezgehek çêkir bo nîşandana wêneyên ku li dû hev dihatin. Navê kir e Kînematoscope. Piştî vê wênegirekî navê wî Henry Hel dezgehek bi navê Fasmûtrûp bo nîşandanê çêkir. Bi nîşandana wêneyên yek li dîf yekê bû sedema vedîtina livîna wêneyan. Kêmasiya wê amûreyê ew bû ku wêneyên bi kamerayên asayî hatibûne girtin nedişyan bi temamî hestên livîna wêneyan nîşanê bîneran bide. (Gîta Girkanî ,Mêjûy sînema,r.22)

Sala 1872an de wênegir Edwar May biradije ji bo qaymeqamê kalîforniyayê ku navê wê Lîland Stanford bû zîncîrek wêne ji bezîna hespan tomar kir. May Bradije wêneyên xwe bi kamereyê asayî girtibû lê belê xwast tişteke nû biafirîne ew jî nîşanadana wêneyên yek li dû yekê bû. Ezmûna May Biradije ji bo afirandina kamerayê û kêşandina wêneyan roleke wê ya gewre heye bo sînemayê. Hewlên wan kesan ji bo çesipandina sînemayê li Emrîka alikariyeke baş a xwe hebû. Lê belê mezintirîn afrînerê sînemayê li wî welatî William Candy Dicson bû. Dicson Birîtanî bû û li Frensayê jidayîkbibû sala 1879an de wekî karmendekî di kompanyaya ‘‘Thomas Edîson’’ hat wergirtin. Sala 1889an de Dicson Kînetofotograf afirand. Ev dezgeh dikare di heman demê de digel şirîta dengê bide nîşandan.



Wilyam dîkson afrînerê rastî ya amûra kîntoskob, amûra kîntoskob bo cara yekê ku filîm bi wê hat pêşandan li Amrîkayê.

Sala 1893an de jî bi alikariya Thomas Edîson amûreya Kînetoskop afirand. Ev amûre pîrr giran bû ango 250 kîlo bû. Nedihat veguhastin. Ji ber vê yekê pêdivî bi çêkirina studyoyekî hate dîtin. Ji ber vê yekê Edîson hizir kir divê studyoyek bo vê amûreyê bête çêkirin. Studyoya "Black Maria" hate çêkirin. Ev studyoya yekem studyoya sînemayê dihêt nas kirin.



Yekamîn stodyoya sînmayê "Black Maria" ku ji alyê "Tomas Adîson" ve hat çêkirin

Kînestoskopa Edison û hevkarên wê bo cara yekem şîrîta filma sililoloyîdî ya 35 filmî bikar anîn. Niha jî ew siloloyîd têtê bikaranîn. (Georges Sadol, Tarîx El-Sînema Fî El-‘Alem, r.22)

Di nozdehê 1889an de’’ Dicson’’ ev amûre anî pêşçavan. Di vê amûreyê de filmeke kurt hebû ew jî ku Dicson xwe kêşandibû li hemberî kamerayê û bi awayekî westiyayî diaxivî. Kînetoskop amûreyek wisa bû ku tenê kesekî dikaribû filma di nava wê de bibîne. 14ê avrêla sala 1895an yekemîn jûr bo kînetoskopê heate çêkirin. Xelk dişiya yek yek berê xwe bide filman de. Ev rawte jî du salan berdewam kir paşê jî qîmeta wê ket. (Teha Kermî, Sînematik, r.20) Sînema li Emrîka wek pişeyeke dilxwaze bi şêwazeke xurt geşe kir. Yekemîn kesê ku ji aliyê hunerê ve hewla çêkirina sînemayê bû, ‘‘Edwîn Ês. Porte’’ ye. Porte him film çêdikirin him jî bo çêkirina amûreyên sînemayî dixebitî. Ew jî di bin karîgeriya derhênerê mezin ê Frensî ‘‘George Mîlyes’’ bû. Wî hewl da şêwazên ku wê serdemê heyî paşguh berew teknîka sînemayî û şêwazên nu yên montajê çê bike. Porte sala 1903 an yekem filma xwe ya ‘‘Dizya Trêna Mezin’’ çê kir. Ev film jî yekem filma destanî ya Emerîkî têtê nasîn de. Ev filmeke bêddeng bû ku ji 8 xulekan pêkdihat. Ev yek jî ciyê şanaziyê bû bo xelkê. Her wiha piştê vê çend filmên li ser babeta sade ya polîsî çê kir. Giringiya xelkê bo sînemayê bû sedema wê yekê ku gelek cihên nîşanadana filman an jî sînemayê bi navê ‘‘Nîklod Bon’’ hat çêkirin. Sala 1908an de li Emrîkayê li nêzikê hezar hol Nîklod hatine avakirin. (Gîta Girkanî ,Mêjûy Sînema.23-25; Georges Sadol, Tarîx el-Sînema Fî El-‘Alem, r.23-26)

1.1.2.2. Sînemaya Birîtanyayê

Birîtanya yek ji wan welatan e ku ji destpêka diruistbûna sînemayê roleke wî ya girîng hebûye. ‘‘Willam. C. Hornar’’ ku afrînerê ‘‘Zuya Trop’’ê ye ku ev amûre bi zivirîna zincîrek ji wêneya cîgir ji hesta livînê ligel bîneran çêdike. ‘‘Lîos Lobrens’’ yek ji wan kesan bû ku cureyeke kamerayê afirand bi navê ‘‘Word Zorin Donistrop’’ di sala 1889an de. Lîos bi vê kamerayê ku bi destê xwe afirandibû li meydana ‘‘Trafîlgar’’ a Londonê filmek kêşand. (Gîta Girkanî , Mêjûy Sînema, r.54)

Di dawiya sala 1880an de li Birîtanyayê komek afrînerên ku bingeha sînemayê bûn, hebûn. Di sala 1896an de ku biraderên Lomyer filma xwe ya yekem li Birîtanyayê nîşandani, ‘‘Bird Akors’’ bi kamereyekê û bi projektoreke ku bixwe afirandibû çend wêneyên xwe nîşanê Encûmana Padişa da.

Yekemîn kesê ku bi şêwazeke fermî nîşanda ‘‘Rabirt. û. Pil’’ bû. Pill di sala 1896an de yekemîn filma destanî ya Îngîlîzî çêkir. Piştî wê çendan filmên di yên kurt jî çêkir, di sala


1899an de jî studyoyek ji bo afirandina teknîka sînemayê tarxan kir ku jê re ‘‘Sawis Gîd’’ digotin. (Georges Sadol, Tarîx el-Sînema Fî El-‘alem, r.23-26)

Pêşketîrîn derhênerê sînemaya Îngîlîzî ‘‘Sîl Hobers’’bû. Di sala 1896an de bi çêkirina sînemayê re mijul bû. Di sala 1897an de pirtûkeke alfebeya filîmsaziyê nivîsî ku wekî yekemîn pirtûka filîmsaziyê tê pênase kirin. Piştî salekê jî filmek çê kir. Ev film jî ji 16 dîmenan pêk di hat ku her yek ji wan dîmenan di dawiyê de digel dîmena dawî tevlihev dibûn. Hobers sala 1907an de cureyek ji tomarkirina dengê afirand ku jê re ‘‘Wiya Fon’’ digot. Di wê salê jî de ‘‘Çarlis Oryan’’ ‘‘Kînemakaler’’ afirand, ku yekemîn şewaza rengî tê pênase kirin.

‘‘Cîmis û Wilyamis’’ du wênegirên xelkê Birîtaniyê ku ji navçeyeke rex deryaya xwerû ya Birîtanyayê bûn di warê zimanê sînemayê de alikariyeke mezin kirin. Herduyan di maweyeke kurt de ji bo bingeha zimanê sînemayê geşedanek mezin çêkirin. ‘‘Wilyamis’’ sûd wergirt ji birrîn û bihevvekirina filman de ku bi vê jî cureyeke montajê afirand. Van herdu derhêneran zû destê xwe sînemayê kirin û dibistana Biraton felemoşk kirin. Di sala 1916an de sînema li Birîtanyayê kete bin bandora sînemaya Emrîkî de. Di wê demê de Ji %95ê filmê sînemaya Birîtaniyê yên Emrîkî bûn. Filmên ku li Birîtanyayê hatibûne çêkirin 20 an jî 25 heb bûn, bes ew jî lawaz bûn. Piştî 1927an de ji aliyê parlamentoya Birîtanyê ve piştgirî hate dayîn, bo qada sînemayê. Her wiha piştî hatina filmên dengî arezûya bîneran ji bo zimanê Îngîlîzî zêde bû bi vê yekê jî sînemaya Birîtanyayê geşedanek da bo xwe. Di sala 1929an de hejmara van filmên ku hatine çêkirin di nav salekê de bilindî 128 filman bûn. Piştî 9 salên di hejmara van filman bûn 225. Bi piştî van geşedanên di warê çêkirina filman de bo duyemîn dewlet Emrîkaye. Belam piştî çêkirina filmên giranbuha, bazara filman rûbirûyê arîşeyan man û çêkirina filman ket. (Gîta Girkanî, Mêjûy sînema, r.55-57) (Saeyd Şîmî, El-Sure El-Sînemaeye mîn El-Sînema El-Samite Ela El-Reqemya, r.20)

1.1.2.3. Sînemaya Firansayê

Fransa cihê destpêka sînemayê tete zanîn. Ev jî bi saya binemalên ‘‘Lomyerî’’ çê bibû. Lomyeriyên mezintirîn afrînerên kamîreya fotograf bûn li Fransa. Biraderên Lomyer bo maweyeke zor, mijûlî vekolîne bibûn bo çêkirina kamereyeke sînemayî. Li ser ‘‘Kînetoskop a Edîson’’ hûrbûn pişt re amûreyek çêkirin bi navê ‘‘Sînematomograf’’ ê. Ev amûreya ku ji hêla wan ve hatine çêkirin him dikaribû wêneyan bikêşe him jî wekî projektor jî dihate bikar anîn. Çapa filman jî bi vê amûreyê dihate çêkirin.



Amorayê (sînematograf) ku ji alyê binemala lomyaran hatibu çêkrin

Tiştâ baş ya vê amûreyê ew bû ku mirov dişiya wê ji ciyekî bibe ciyekî din. Dişiyan li ciyê rûdanan de amede bin û wêneyên li wir bigirin. Ew filmên ku bi Sînematoğrafîyê dihatin girtin û nîşandan gelek zindîtir û azadtir bûn ji filmên ku li studyoya "Edîson" de dihate nîşandan. Mezintirîn cudayiyên di navbera filmên "Edîson û Biraderên Lomyer" de ew bûn ku filmên Lomyeran li bo bîneran salonekê dihate nîşandan ku ne ji bo kesekî tenê bû belam tenê kesekî dikaribû di Kînetoskopê "Edîson" de berê xwe bide filman de. Gewretirîn biryara Lomyeran ew bû ku filmên xwe bi xêrayî 16 Firêman(Wêne) di xulekekî de digirtin. Belam xêrayiya Kînetîskopê ji 46 firêman di deqekî de pêkhatibû. Yekem filmên "Lomyeriyên, Hatine derve Karkerên di nav karxaneyan" bû. Di meha adara sala 1895an de hate çêkiri bi nîşandana navûdeng a 28ê Decembara heman salî de digel neh filmên din yê kurt di salona "Grandkafe" ya li Parîsê hate nîşandan. Ew in film jî "Hatina Şemendifêrê Bo Cihê Xwe, Nandana Zarokan-Dîmena Binemala Agost Lomyer ku xwarin didine zarokên xwe pêk dihat, Baxawanê Ku Baxçê Xwe Av Dide" ku lomyeriyên digotîne van filman "Rûdanên Rojane".



Yekem dîmena fîmên biraderên lomyer ku di sala 1895anda hatye kêşandin. Hatine derve Karkerên di nav karxaneyan ji lîon



Yekem wêneya sînemayê dli sala 1895a hat pêşandan li parîsa firensayê, hatina tîrenê ji bo meydanê xwe.


Li gel van filman filmên xeberî beşek din bû ji karê wan. Filmên Lomyeran dest pêk a filmên dikomenterî têne hesabandin. Biraderên lomyer di demeke kin de komek wênegir li Ewropayê belav kir bo berhev kirina rûdanên balkêş û cihên balkêş. Di heman demê de mijûlî pêşandina filman bûn di wan salonên ku ji bo nîşandana filman hatibûne veqetandin. Piştî wê, sînore Ewropayê derbas bûn û berê xwe dane welatên di ku bi sedan film bi vî awayî çê kirin. Dîroka sînemayê li gelek welatan bi rêya sînematografên Biraderên Lomyer belav bû. Li sala 1896-1897an de sînematograf pênc kîşwer derbas kir. Sala 1897an de Biraderên Lomyer biryar didin ku sînematografê bifroşin ku ev jî dibe sedema pêşketina sînemayê. Hêza pêşveçûn û dîtina tazegeriya ango nûjengeriya di sînemayê de ewqas mezinbû birayên Lomyer nedîşyan xwe li hember wê pêşveçûnê bigirin û sala 1995an de jî birayên lomyer kompanyayên xwe bo heta hetayê girt û vegeriyan karên xwe yên pêşîn ku ew jî afirandina amûreyên fotografîyê. (Georges sadol, Tarîx el-Sînema fî el-‘alem, r.10); (Saeyd Şîmî, El-Sure El-Sînemaeye mîn El-Sînema El-Samite Ela El-Reqemya, r.22) (Georges Sadol, Tarîx El-Sînema Fî El-‘Alem, r.24)

Sînema li serî da tenê pêşandana jiyana û rewşa civakê bû, pêşandana wêneya li pey hev yek hatina wêneyên rojane ya civakî mîna tomarkirina hat û çûn a sivîla û hatina tîrenê ji bo mîdana xwe. Çend wêneyên avdana baxçeyê di gel reqsa xortan, êdî civak li wan karê belgeyî û dubare berve aciz bunê diçû, ji ber ku ew dîmen dubare û dubare dibûn, çî nema bû civak bi temamî destê xwe ji sînemayê berdet.

1.1.3. Georges Mîlyes Û Têkiliya Wî Li Gel Sînemayê

Heyamek sînema bi vî rengî berdewam bû, ji aliyê teknîkî ji ber bi pêşveçûn û kamêrayên cûr bi cûr dihatin saz kirin, lê dîsa ji aliyê derhênan(çêkirin) û nivîsandinê ve weke xwe ma û tenê nîşandana jiyana asayî bû, ev cûrên nîşandanê jî bi sedema dubarebûn û sadeyiya dîmenan hêdî hêdî temaşevanên xwe ber bi kêmbûn û bê hêvîtiyê dibir û bîner kêmtir çêj û lezet didîtin ji van dîmenan, heta hatina derhênerê navdarê Fransî (Georges mîlyes), ku ew rengeke din da sînemayê, ew karîbû ji bo cara yekemîn filîmek saz bike ku çîroka wê hebe deqa wê bi şewaza deqa wêjeyî bê nivîsandin, Mîlyes bi vî yekê tê nasîn ku sînema rizgar kiriye, ev jî bi anîna ‘çîrok’ û ‘efsane’ û ‘xeyal’ ji bo nav sînemayê, wekî me li jor gotibû bîner dîmenên (livdar) û (bûyerên rojane) “Lomyeran” dîtin û dîsa dîtin di hol de ew heza hercar bi wan re nema, Mîlyes bi sedema anîna cadûyên (sihirên) wêje û janirên (beş) ku wî anî, dubare bû sedema vexistina agirek ku heya niha her mezintir dibe. “sînemaya dramî” heta îro ku 123sale paja sereke û b’êza sînemayê bûye, êdî destpêk a pêwendiyên wêje û sînemayê avabû, ew bû sedema sûdyê ji deqên wêjeyî bê wergirtin. (Teha Kermî, Sînemafîk, r.33). (Georges mîlyes) wek yekemîn kes tê hejmartin ku janirên (beş) wêjeyî di sînemayê de bikaranî ye, bi vî awayî destpêka guhertina deqên wêjeyî ji bo senaryo û şewaza sînemayî hate guhertin. Georges Mîlyes yekemîn kes bû ku bi vî re destpê kir, wan

filîm dîmen pey dîmenê bikişîne û girêdayî hev bin jî, weke çîrokeka wêjeyî wate bide, ango destpêka dasaza çîrokê ji filîmê re watedar be, Mîlyes wekî kesekê şanovan pêwendiyên şanoyê bi sînemayê re pîrr rind girêdaye, wî karî şano bo hemû şêwaz û teknîkên şanoyî bîne nava sînemayê, ev cûrê xebitîn ji şêwaza şanoyî bo heyameka dirêj berdewam bû, her ji destpêka tevlîbûna wêjeyê bi sînemayê re, pîrraniya berheman bi rengê şanoyî dihat encam dan, ango li ser texta şanoyê û di nava holan de, ev jî di nav çar dîwaran de û di stodyoyan de dihat kişandin. (Saeyd Şîmî, El-Sure El-Sînemaeye mîn El-Sînema El-Samite Ela El-Reqemya, r.35)



Georges mîlyes li sala 1896an de kompanyayê(starfilîm)î îna pêkanînan û ta sala 1913a wek derhêner,berhemhêner,lîstikvan(aktor)û wênegir,nêzê (500) filîmakurt îna sazkrin

Georges Milyes piştî ku nikarî Sînematografîyê ji lomyeran bikire, amûra (Anîmatografî) dahênerê Birîtani (Rabêrt.U.Pal) kirî. (Saeyd Şîmî,El-Sure El-Sînemaeye mîn El-Sînema El-Samite Ela el-Reqemya,Rû:34) piştî çend in guhertin û nûkirinan, kamera saz kir, ewî jî bi şewaza xwe filîm saz kir, Milyes di sala 1896an de beşgeha (kompeniya) (Star Filîm) avakir, heta sala 1913an wekî derhêner, berhemhêner, aktor, kemeravan nêzî 500 kurtefilîm saz kir.Serkeftîrîn û baştirîn nimûneya karên wî filîmek bû bi nave (Sefer ber bi heyv) di sala 1902an de, vê filîmê navdartirîn filîma wî bû ku ji 30 dîmenan pêkhatibû ku b'xwe jê re digot (Tablo) van tabloyan di yek goşeyê de hatin kişandin û bi (Dîzlof) bi hev re hatine girêdan, wan tabloyan yek li dû yekê tê û qonax pey qonaxa vê seferê ji me re dibêjin. (Teha Kermî,Sînematik,r.33; Georges Sadol, Tarix El-Sînema Fî El-'Alem,r.35-38)



filîma (Sefer ber bi heyv) di sala 1902an de, vê filîmê navdartirîn filîma Georges mîlies Milyes bû ku ji 30 dîmenan pêkhatibû ku b'xwe jê re digot (Tablo)

Piştî vê qonaxê Mîlyes û hevalên wî, sînema karî şewaz û naveroka seranser bi xwe ve bibîne û di nava çar dîwaran de derkeve û dîmenan jî bîn guhertin, herwiha sînema gelek sûd ji şanoyê girt, lê her wekî şano di çarçoveya teknîka şanoyê de ma, ji bo heyameka dirêj heta ku hinek ji sînemakaran rabûn bi şikandina vê pêwendiyên sînema bi şanoyê re, sînema rizgarkirin ji vê kot û bendên tede bû ku tenê li ser texta şano û di nav stodyoyê de dîmen dihatin kişandin, wan kesan rabûn bi azadkirina kamera û veguhestina vê ji bo derveyê van dîwar û stodoyan, yek ji wan (Dubis Sî Burtir) bû ku karî di filîma (Dizîna Tîrena Mezin) de karên xwe ya filîmê li derveyê stodyoyê encam bide û bibe destpêkek ji bo anîna kamerayê li derve. . (Gîta Girkanî ,Mêjûy sînema,r.23)

Sînema di destpêkê de pirranî karên xwe bi şewaza teknîka şanoyî pêşkêş dikir wek: şahkarên (Hoco, Şekspîr û...), lê ligel rizgarkirina kamerayê di vê çarçoveyê de êdî hizra dasazkirina senaryoyên sînemayê avabû û pirranî ew karên şanoyî ku bi awayî şanoyî dihatin pêşkêşkirin cardin kirin ser şewaza sînemayî û hatin amade kirin û kişandin, êdî dem û cih di filîman de hat diyarkirin van filîman rengê sînemayî ya nû bi xwe ve dîtî, mînak: şahkarê (Hamlêt) ya Şekspîr ku bi gelek şewazên filîm ên sînemayî hat derhênan(çêkirin) an nivîsên (Samwêl Bêckt), (Mût Bac Ciwal) û (Arser Mîler) û gelek din kirin filîm, bi vê awayî sînema li serêya şanoyê dûrket û ber bi sînemaya nû gav avêt ku rê û rêbaza taybet bi xwe dozî û dît di dîroka xwe de, sînema pêşket û nesekinî, ev pêşketin jî bo sedema karameyî û çelengî sînemakaran û sûd wergirtin ji pajên wêjeyê û ew praktîzekirina ku di dema karkirinê de hebûn.

1.1.4. Diristbuna Sînemaya Dengi

Ji destpêkê an ku 1895an heta salan 1930î di dîroka sînemaya de wek, Serdema Sînemaya Bêdeng, tê binavkirin. Ev beşkirin tiştêkî sirûştîye. Ji ber ku bidengkirina filman di sînemaya de şoreşeke mezin pêkanî ye.

Ji sala 1895an heta sala 1930î wek serdema sînemaya bêdeng tê hesabandin. Di vê serdemê de hejmara filmên bêdeng gehaşte 150.000i. Ji wan filman nezî 25.000 film gehaştine roja me. 37 Her dewleta ku nû ava bû filmên beriya xwe yê dijî raman û îdeolojiya xwe şewitandin. Bi taybetî piştî şoreşa Bolşevîkan, piştî desthilatdariya Naziyan, Faşîstên Îtalya û guherînên welatên di gelek filmên dijî rejimên nû hatin şewitandin. Bi vî awayî ji 150.000 filmî îro di destê me de tenê nezîkî 25.000 filmên bêdeng mane.

Filmên pêşî yê ku direjbûna wî ji seatekê direjtir li Awistiralya ye hate kişandin. Di sala 1906an de bi navê Çeteya Kelly bû. (Geoffrey Nowell-Simth, Dûnya Sînema Tarihi, wer: Ahmet Fethi, Weş. Kabcacı Yayınevi, İstanbul, 2008 r.28)

Piştî ku sînemayê bêdeng 25 salan dembir, zanayê sînemayî şyan deng ji boy filman bi hênin kar înan. Bi kar înana deng ji yo filman bo cara êkê çend filmeka kurt konisrî bûn.

Li sala 1927 bi derîna filmê (sitrab bêja caz) li rol bîna (al caksun) ji bo cara êkî bu ku deng de gel wênan hate pêşandan li ser perdên sînemayê. (Andre Bazin, Sînema Nedir? Wer: İbrahim Şener, Weş. Doruk Yayınları, İstanbul, 2013, r. 50)

Gohrîna sînemayê bêdenk ji bo sînemayê dengî bi sedema arîşê teknîkî ji bo salekê dem kêşa, de gel wan arîşê teknîkî û gelek zehmetên zor jî sînemaya dengî hat ji dayk bûn. Di pêşî da gelek hunermend û derhênerên sînemaya bêdeng dgel wê êkî nebûn ku sînema deng bo bête zîdekrin, ewan zêdekirna deng jbo sînemayê bi kêm kirna behayê sînemayê ved geran û bi tirseka kujekî sînemayî datna û balvokek weşand li dja sînemayê dengî, çarlî çapîln û enîştayn li wan kesan bûn ku wê weşandin mirza krin. Sînemayê denkî ji blî nusîna qseyan pêtvî bi deqaê tamamê sînemayê bû, nusîna defê sîtemayî pêtve bi nuserê nwê hebû ku şyatê we karê hebêt li edeb û zmanê li yek den mifyê li herdûkan wergirê. e dî sînema wekî hunerka bala karî bi demeka kêm bi şeweyekî ber fireh pêşkeft, ew tiştên ku rindî û canî da bi wê hunerê ewe bu ku şya li hemî beşên edebê mfa wergirit û wekî keristeyekî bi bha bkar îna, we li her qonaxekê pêşkevîna baş bi xwe bînî û bi şeweyeka bre çav hat pêşketin û ew jî bi şyana hunermenda hate ava krin, îdî sînema heta nuha li zede bun û pêşkeftdaye (Geoffrey Nowell-Smith, Dûnya Sînema Tarihi, r. 28)

1.2. Dîroka Sînemaya Kurdî

Paşhatina bizav(tevger) û çimkî zanistî û hizrî di sînemayê da eve bo me derket ku sînema beramber hunerên din ya pêşxwe rêya hezar salî di demê sed salan de derbas kir.

Eve ku têt behskirin,sûid wergirtina hemû desthilatdarên mezinên cîhanê ji wê hunerê hate wergirtin.Ev sûid wergirtina vê hunera sînemayê vedigere ji bo hestkirina bi girîngiya hestiyariya karkirina vê hunerê ye.

Berçav girtina pêşveçûna lez ya sînemayê û pel vedana vê hunere ji bo tevahiya hemû ciyekê li ser vê cîhanê,hinek ji neteweyan heya heyamek derengtir wek amûreyeke pêşketinê ji vê hunerê werdigirtin, ev jî wek hemû pirsên din, kêşeya lawaz bûna nebûyîna deshelatdaran û taybetmendiyên ev netewên dî vî sed salên pêşî daye ku sînema têda serî hildaye û pêşket.Neteweyên jêrdest berçav neteweyên serdest gelek derengtir destên gêhişte sînemayê,ev jî girêdayê bi alîşeya dîrokî ev dû nakokiyên jêrdest û serdest hebûne.

Neteweyên Kurd jî wek neteweyekî xwedî kiltûr û zimanê taybet û di heman demê da jêrdest, derengtir ji neteweyên serdest dest bi sînemayê kir, helbet sînema li Kurdistanê niha jî wek xebatekî takekesî tê berhem, (Bi vê wateyê xebatekî sînemakarê kurd,ne wek sîstemekî binaxe ji bo darêştina sînemayî). Di rastîya de taka sînemakarê Kurd di sî û pênc saliya dawiya sedsala bîstan de ji sînema encam wergirt.

(<http://www.milletpress.com/BirwraDetail.aspx?Jimare=2322> , Şaho Seîd. D.G ,16/01/2017).

Eger bi şêweyekî giştî û xurt bixwazin behisa li mijara sînemayê li Kurdistanê biken, bêguman dibe li çend lêkolînên têr û tesel hemû aliyên sînemaya Kurdî lêbikolin, lewra li vir tenê çavgeriyaniyê bi dîroka sînemaya Kurdî biken. Dîroka sînemaya li Kurdistanê wek sînemaya neteweyên din rojhelata navîn, li destpêka sedsala bîstan de filîmsazên rojavayî ji bo berhemên Itnotografî (mirovnasî wêne) hatine nav a van welatana û filîmên dikomenteriyan (belgeyî) li ser kurd û turk û lor û hew çêkirin. Lê hêj jî nikarîn bi bawerî bêjin ku li vî serdemê da sînema hatiye li nav a Kurdistanê. (Reza Elî Pûr, Sînema Le Pêgey Hunerda, Gowra Film, Jimare 1, Weş. Rêveberya Sînemaya Silêmanî, Silêmanî November 2009, r.19)

Yê herî lêhatî dîrok ji bona destpêka sînemaya di Kurdistanê derketina berhemên (Yılmaz Gûnayî) ye, le pêş Yılmaz Gûnayî berhemên din, habûne ji berhemên hênana filîm li Kurdistanê, lê televîzyonî bûne yan neyarên Kurd li ser Kurdistanê çêkirin e, ku bi giştî em neşên bixine nav çarçoveya dîrokî sînemaya Kurdistan yan bi sebaba telefzyonî bûna wan, naçine çarçoveya dîroka sînema li Kurdistan. Eger çi hinek wiha dizanin ku filmî (zariya) yekemîn filîma kurdiye ku sala 1925a ji aliyê derhêner (Heme Begî Nazaryan) senaryo û derhênan ji bo vêhatiye kirin, raste filîm besa kirdarên ermanya dike, lê ji bo me, ew filîmeke Kurdî nine, çimkî ne derhêner kurde û ne jî li Kurdistanê wêne nehatine girtin. Ev film ji çîrokeke folklorîk hatiye wergirtin. Mijara wê kurekî şivan e ku ji keçikeke Kurd hez dike lê ji ber zilm û zordariya axa keçik nema dikare tevbigere û dibe hevsera axa de. Ev film filîmeke bêdeng e di sala 1925an de hatiye çê kirin. Piştî vê filmê du derhênerên Kurd hebûn di sala 1950-1960an de li Kurdistana bakur "Ferhat Cîhan û Kurdxan" film çê kirine ku filmê wan bûne male sînemaya Tirkî lê wek Yılmaz Guneyî deng nedane. Li Tirkiyê derhênerê Tirk hebû bi nave "Ardan Kral" yek ji derhênerêkî bi navûdeng e li Tirkiyê ev derhêner du film çê kirine ku li ser kurdan in. Bi nêrîna min ev derhêner wekî hemî derhênerên Kurdan xizmeta sînemaya Kurdî kiriye.

Yek ji filmên Ardan Kral a bi nave "Werzek Ji Hekkariya" baştirîn film e ku li ser Kurdan di sala 1995an de hatiye çê kirin. Filma duyem ya li ser Kurdan hatiye çê kirin "Dilan" e. Ev film jî bi şêweya çîroka filma Zarê ye. Ji hela teknîkî ve bi şêwazeke nû ku di sala 1998an de hatiye çê kirin. Ji ber ku film bi Tirkiyê mirov wê bike nav çarçoveya sînemaya Kurdî de. Em dikarin wek amaje behsa vê filmê bikin lê neşên wek sînemaya Kurdî pênase bikin.

Seretaya sînemaya Kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê lihev kirine ku seretaya sînemaya Kurdî di sala 1982an de destpê kiriye. Bi destê hunermend û nûserê mezinê Kurdî "Yılmaz Guney" hemû sînemakar û nûser li ser vê tiştî hemfikirin ku Yılmaz Guney despêka sînemaya Kurdî bi filma "Rê" destpê kiriye. Ev film jî yekem filma Kurdiye ku

biçe fîstîvala ‘‘Can’’ ku xelata’’Çîqa Dara Xurmeya Zêrîn’’ dest xwe bîne bi hevbeşiya digel filmeke Yewnanî bi nave ‘‘Winbû’’ bi derhêneriya ‘‘Gosta Gavrans’’ hatibû çê kirin.

Ev serkeftina Yılmaz Guneyî derwazeyek bû ku hunermand, nûser û derhênerên Kurdî bifikirin ku karan li ser sînemaya Kurdî bikin. Dengvedaneke mezin bû. Ji ber hindê jî Yılmaz Guney bi seretaya damezîrînerê sinemaya Kurdî tete nasîn.

Piştî mirina Yılmaz Guney sala 1984an da gelek filîmsaziyên Kurd bi filîmsaziyê mijûl bûn. Lê li Kurdistanê filîmsazekê wekî Guney serî hilneda ku cihê penca wî diyarbit û bikare hêzêk li sînemayê kurdî zêdeke, lê di salên dawiya sedema bîstem da (Behmen Qubadî) filîmsaza kurdî ya rojhelat, karî hêzekî sînemayî çêbike, sinorên Êran derbas kir û zorek li fîstîvalê cîhanê da komek ji xelatî gring bidest xist. Behmenî qubadî li demeke wek filîmsazekê tê naskirin ku ziyatir ji panzdeh sala bi ser koça derêhêrê mezin Yılmaz Gunay derbas buye, bêguman di vî demê de filîmsazên din karin filîmsaziyan bikirana, lê Behmen bi rûçûn bi azarên kurd li rojhelata Kurdistan da bangeşeya sînemayeke nû kir, ew di filîma "Dema hespên serxweş" da cûreke cuda li sînemayê ve vê serdemê Êran bi dinyayê da nasîn

Behmen Qubadî bi pêşandana azarên komalgaya Kurdî bi alîkariya lokeyşînî (dest lênedan) rûpelek nû li sînemayê kurdistanê da hilda, Behmen hingavek ji Yılmaz Gunay pêş da avêt, ev jî kurdbûna zimanên filîmên wî bû. Behmen Qubadî bi a kurte filîm destî bi karê filîmsazî kir, wate di kurte filîman de çî ji aliyê teknîk û çî ji aliyê naverokê xwe pêşve bir û paşê ew azmûnan a gelek alîkarî didan wî, bi dirist kirina yekem filîma dirêj serketineke bê mînak bi dest dixê. Mijarên sereke yê filîmên Qubadî pêkhati bû ji sinor, dest kurtî û hejarî ronîştîyên sinorên çêkiri yê Kurdistan, mozîka Kurdî di her çar filîmên seretayê da (Dema hespên serxweş, Kûsî jî difirin, sitrana welatê dayika min, nîv heyv) em babetana bi ronî diyar in.

Paşê van çar filîma, yek ji girîngtrîn rexneyên ku beramber behmen bûye, ev bû: berhemên Behmenî girêdayê lokeyşnê (cih) kurdistanê û bercestekirina zarên çîna hejarê kurdistanê ye, ango Behmen bi firotina dîmenên ji fîstîvala biyaniyan, kariye komelek xelat kom bike, ji aliyek din rexneyeke din ji aliyê komelgayê Êran, ev jî behskirina Behmenê bû ku dixwaze kurdistanê wek dûrgeyek cuda ji Êran ji Tehran nîşan bide, her ji bo yeke Behmen li pêncemîn filîma drêja xwe de mijara berhemên xwe gohart. Li dû filîma dawî Behmen ji aliyê naverokê de hîç peywendîyeke organî bi filîmên pêştir nebû her wiha peywendîyeke bi komelgaya Kurdî û tenê lokeyşînî Kurdistan venebû, filîmên (kes hay ji Pişikên Êranî nîne, Demsalên Kerkedana) ku nekarî serkeftineke filîmên pêşxwe dúbareket.

Di vî serdemê da li Kurdistan komelek filîmsazî din serîheildan, lê hîç ji wan nekarîn ew geşeya behmen bike nû nekarîn karşgeriyeka wisa berçav li ser sînemaya Kurdî çêbiken. Di vî serdemê de'' Xelîl Uysal, Kazm Oz, Nizamedîn Arîç, ''filîmsazên bakurî yên Kurdistan, Bi veşeriyên ji komelgayê Kurdistanê karîn çend filîmêkî Kurdî berhem bihênin.

Selman Fayîq, Mehdî Umêd, Cano Rojbeyanî, Huner Selîm, Şewket Emîn Kurkî, filîmsazên Kurdîstana Başûr, çendin filîmên Kurdî berhem hêna, ji nav van filîmsazan de Huner Selîm û Şewket Emîn karîn cî penceya xwe li sînemaya Kurdî diyarî biken, bi a filîmên (Kîlometir zîro, Welatê tal û şîrîna Min) ji aliyê hunermend Selîm û (Ciyek bo yarî, Bireweriya serberî)î Şewket Emîn, ku karî komek xelatên cîhanî bi dest bixwe, filîmsazên din ê Kurdîstana Başûr li gel a çend filmê Kurdî nikarîne rêyên bo sînemaya Kurdî dirîstbikin.

Teyfor Bethayî derhênerê Rojhelatê Kurdistan li sala 1984da filîmekî dakomenterî bi navê (nan û azadî) dirîst kir, ev filîma di dîroka sînemayê Kurdî de "Yekem dîkomenterî sebarek bi Kurdistan "Tê destnîşankirin, teyfor bethayî wekî din di vî filîme de, berhemên din serkeftî nebûye.

Li Rojhelatê Kurdistan di destpêka sedsala bîst û yekan de, filîmsazên wek Remîl Rostemî, Earamî 'Elîdî, İbrahîm sedî, Celal Seyîd Pena çend berhemê sînemayê dirîst kirin. Mano Xelîl filîmsazekî rojavayê Kurdistanê jî, di destpêka a sed sala bîst û yekî da, komek berhemê dîkometarî berhem anîn. (Hevpeyvîn Li gel Sînemakar û Derhêner İbrahîm Remezan)

1.2.1. Sînemaya Başûra Kurdistanê. (Hevpeyvîn Li Gel Şaxewan Mistefa)Yê.

Yekemîn filma Kurdistan başûr di sala 1974an filmeke Kurdî hate çê kirin. Ev film wek sînemaya Parastin î tê pênase kirin. Piştê kêşandina wê qediya, di karê montajê de li welatê Îranê ji aliyê rejîma Îranî ve hate desteser kirin. Navê filmê "Berew Xor" e. Em dikarin bibêjin ku ev film destpêka sînemaya başûr e. Her çend ev film hat jina birin belam belgeyên wê filmê di destên me de ne, ew film nehatiye çê kirin hunermendên wê filmê wek "Zûhêyr Ebdulmesîh" "Newzat Mecîd" wênegir û derhênerê wê filmê bûye.

Piştê wê filmê 1991an de derhêner Mehdî Umêd li derveyî welat yekem filma xwe çê kir bi nave "Tunel" ku bixwe destpêkek e ji bo filma Penaberîya Kurdî. Ev filma ji erdnigariya Kurdistan hatiye wergirtin. Wênegir û teknîkarên wê hemî Rûsî bûne. Tenê hinek aktor û derhênerên wî Kurd bûne. Di heman demê de sala 1991î de berîya raperîna Kurdîstana başûr filmek hate çê kirin bi nave "Nêrgîz Bûka Kurdistan" ji derhêneriya "Cafer Elî" derketiye pêşberî bîner ku bixwe iraqî ye. Ev film di serdema rejîma Îraqê de hate nîşandan. Piştê raperîna Kurdistan a sala 1991î Huner Selîm piştî azad kirina Kurdistanê filmek çê kir ku teknîkerên wê filmê Îtalî bûn. Ew film yekem filma Kurdî tê zanîn piştî azad kirina

raperîna Kurdistan a Başûr. Navê filmê “Şor” bû. Di wê filmê de cara yekem bû ku hunermendên kurd ên başûr tê de leyîstin.

Piştî raperîna Kurdistan a başûr di sala 1990-1993an livîna çêkirina filmê hebû. Lê sîstema çê kirina filmê sîstemeke vîdîoyî bû. Li gorî qaîdeyên televîzyonê bû ku em nikarin wê bikine nava çarçoveya filmên sînemayî. Yek ji wan hunermandan Kameran Raûf bû ku şîya sê filmên can ên baş çê bike. Ji ber ku sîstema filman vîdîoyî bûn, sînemayî nebûn ji ber hindê mirov nikare bêje ku ew film filmên televîzyonîk in. Yek ji wan filman bi nave xwe “Mergî Erxewanî” bû ku bi awayekî baş serket. Ji bilî wan hunermandan Celîl Zengene jî hebû ku ew jî filma “Xulepîza” çê kir. Ev film jî sîstema vîdîoyî bû. Filmên bi vî rengî rê vekir ji bo hunermendên Kurd ku bo dirist kirina filmên sînemayî bifikire.

Heke em behsa filmên televîzyonî bikin nêzîkî pêşîya raperînê û piştê raperînê 50 filmên wisa hene. Ji bilî van du filmên televîzyonî beriya raperînê jî hebûn. Bi nave “Kewnederke” ku bi derheneriya “Sadûn Yûnis” bû. Ya din jî bi nave “Nûserekî Seyr” bû ku ew jî bi derheneriya “Kamûran Raûf” hatibû çê kirin.

Yekem filma kurdî ya ku bi teknîkarên kurdî ve hatiye çê kirin filma “Rawe Cinoke” bû ji hêla derhiner Mehdî Umêd sala 1999an hate çê kirin. Ev film jî wekî filma Kurdî-resen tê pênase kirin. Çimkî him teknîkar him aktorên wê Kurd bûne him jî ji hêla hukimeta herêma Kurdistan hatiye berhemînan. Budçeya wê filmê ji hêla hukimeta herêma Kurdistan ve hate dayîn ji ber van sideman dibe filmeke resen a kurdî. Di heman salî de 1999an de hunermendê mezin ê Kurd “Behman Gûbadî” yekem filma dirêj a xwe kêşand. Ew film bû sedema dengdayîneke mezin di sînemaya Kurdî de. Navê filmê “Dema Hespên Serxweş” bû ku bûdçeya filmê ji hêla derhêner ve hate dayîn. Ji bo çê kirina wê filmê mala xwe firot. Ew film Kurdistan a rojhilat hatiye kêşand in. Behman Gubadî bi filmên Kurd dest bi çêkirina filman kiriye. Yekem filma wî ya kurt bi nave “Wekî Dayika Min” bû. Filma wî ya duyem “Kûsî Jî Difirin” di sala 2001an de hatiye çê kirin. Budçeya wê filmê ji aliyê hukimeta herêmî Kurdistan wezerata rewşenbirî ve hatibû dayîn. Film li Kurdistan a başûr û Kurdistan a rojhilat hate kêşandin.

Paşê di sala 2002an de careke din derhêner mezin Mehdî Umêd filmeke dî bi budçeya Hukimeta Herêmî Kurdistan filmek çê kir ku nave “Hesp” bû. Ev filma behsa kêşeya Kerkukê dikir. Ev film jî difîneke ji bo kêşeyên Kurdî. Ev dîtîna piştê demekî bûye rastî bixwe. Paşê di sala 2003an de derhêner Huner Selîm filmek çê kir ew jî bi budçeya Hukimeta Herêmî Kurdistan hatibû çê kirin bi nave “Kîlometr Zîro”. Piştê wê filmeke dî çê dîke ku ew jî li ser hesabê Frensî û Ermenîyan e ku nave filmê jî “Vodka Lîmon” e. Ev film çûye çend festîvalên cîhanî û bi çendîna cara jî xelat wergirtiye ev jî bûye sedema piştgirî girtina Hukimeta Herêmî Kurdistan bo çê kirina filma “Kîlometr Zîro”.

1.2.1.1. Rêveberiya Sinemaya Kurdî Li Kurdistanê Başûr Kengî Dirustbû ye?

Detpêka sinemaya Başûrê Kurdistan bi hevkarîya hunermendên derveyî welat destpê kir. Ger filmek li derveyî Welat hatibe çê kirin û piştî ku serketi be di fîstîvalên sinemayî ya cîhanî de piştgirî ditîtin ji hêla hukimeta ‘Herêma Kurdistan’ê. Mînak: Mehdî Umêd, Huner Salîm û Behman Gubadî piştî ku xelat wergirtin Hukimeta Herêma alikariya wan kir. Êdî film dihatine çê kirin ku Hukimeta Herêma jî alikariya wan dikir. Piştê van buyeran Hukimeta Herêma dît ku dive rêveberiyek bête ava kirin bo bîrêvebirina karên sînemayî û sala 1999an de bîryara çê kirina dezgeheke sînemayî hate dayîn. Cara yekem bû ku rêveberiyêke bi nave ‘‘Rêveberiya Sînemaya Hewlêr’’ bi Wezereta Rewşenbîrî û Lawan a Hukimeta Herêma Kurdistan hate ava kirin. Roja avabûna rêveberiya sînamayê heta roja îro nêzî 24 mîlyon dolar alikariya sînemaya Kurdî hatiye kirin.

Yekem filma kurdî ya ku bi budçeya Hukimeta Herêma hate çê kirin filma Nêçîra Cinan (Rawa Cinoke) ji hêla derhêner Mehdî Umêd bû ku hemdem bû digel avabûna rêveberiya sinemaya Herêma Kurdistan di sala 1999an. Piştî vê filmê filma ‘‘Kosî Jî Difirin’’ bi derhêneriya Behman Gubadî ku ew jî duyem filma bi rêveberiya sinemayê tê zanîn. Piştî van dest avêtin kurtfilm û Filmên di. Destpêk ê de tenê rêveberiya sînemayî ya Hewlêr tenê hebû. Paşê jî li Dihok û Silêmanî jî heman rêveberî hatine ava kirin.

Berîya raperîne yekem filma sînemayî ya li Başûrê Kurdistan hatiye çê kirin ‘‘Nêrgîz Bûka Kurdistan’’ e ku montaja wê li Îranê çê bûye lê ji hêla rejîmê ve hate şewitandin. Filma piştê raperîne jî filma ‘‘Şêro’’ ye.

Heke em berê xwe bidine sînemaya kurdî ya Kurdistanê başûr sînemayêke baş nebûye, wek her beşeke di qonax bi qonax çûye. Ez bi xwe jî sinemaya Kurdî bi çend qonaxan pêname dikim an jî wê beşeke cîyawaz dibînim.

1-Penaberîya Sinemaya Kurdî: Ew sînemayê ku li derveyî Welat hatiye çê kirin. Bi wateyêke din ew film ên Kurdî ne ku li Welatên biyanî hatine çê kirin. Ji ber arîşeyên sîyasî, aborî, tunebûna lîstikvanên sînemayê û tunebûna teknîkekên baş derhêneran filmên xwe li derve çê kirin û sûd ji wan derên lê dijîyan wergirtin. Bi pereyên rêxistin, dezgehên taybet û kompaniyên filmên xwe çê kirine. Di vê qonaxê de komek film hatine çê kirin. Mînak: ‘‘Tunêl’’ ku derhêner Mehdî Umêd çê kir, Mehdî Umêd û Teyfûr Petayî filmeke din çê kirin bi nave ‘‘Gelegurik’’, filma ‘‘Beheşteke Sofî’’ ku ew jî bi derhêneriya Umêd reşîd li swêd hatibû çê kirin, Husên Sêwdîn ‘‘Çarçoveya Şikestî’’, Huner Selîm komek filmên wî yên bi vî rengî hene ‘‘Bijî Bûka Azadiya Kurdistan, Domahî Şemendefêr, Heke Tu Nemirî Ez Te Dikujim hwd.’’ Li penaberiyê hatine çê kirin ku bi giştî 14 film in. Jimareyên van filmên wiha di wê demê gelek bûn. Sînema ji bo Kurdan babateke nû bû her wiha ji ber ku Herêma Kurdistan ji hêla aborî û sîyasî ve nebaş bû film li wê derê ango li derveyî welat li dîasporayê

hatine çê kirin. Hemî berhemên filmên sinemaya Kurdî li hemî deverên Kurdistanê ji filma “Rê” ya Yilmaz Guneyî heta niha nêzê sed filmên sînemaya Kurdî hatine çê kirin.

2- Başûrê Kurdistan Beriya Raperînê: Di vê qonaxê de komek filmên televîzyonî hatine çê kirin. Di vê qonaxê de tenê filmek sînemayî bû, ew jî filma “Nêrgîz Bûka Kurdistan” bû. Lê mixabin bîneran neşiyar fîlmê temaşe bikin ji ber ku film jina yek bû.

3-Başûrê Kurdistan Piştê Raperînê: Di vê qonaxê de di navbera filmên ku li penaberiyê hatine çê kirin û yên li Başûrê hatine çê kirin de têkiliyek heye mînak: film li Başûr hate çê kirin bes alîkarî ji hêla welatên bîyanî ve çê bûn. “Bistek Sînor” û “Şêro” jî van filman in. Ev qonax jî heta sala 1999an berdewam kir taku Rêveberiya Hukimeta Herêmî Kurdistan hate damezrand in. Heta niha jî çê kirina filman li Herêmî Kurdistan berdewam e. Her wiha li navçeyên di ên Kurdistanê jî derhêner ji bo çê kirina filmên xwe tene Başûrê Kurdistan. Çimkî ji bo çê kirina filman derfet baş in, bi taybetî jî hunermendên Kurdistanê Rojhilat jê sîdê wergirt in. Mînak filma “Mandû”, “Giriftekanî Çaplîn” û hemî filmên derhênerê mezin ên Behman Gubadî li Kurdistanê Başûr hatine çê kirin. Her wiha derhêner “Cano Rojbeyanî” ku bixwe jî demekî penaber bû û pişt re veberiya Kurdistan dest bi çê kirina filman kir filmên “Jiyan, Yek Mamik Du Mamik û Çiyakanî Çaplîn” çê kir.

4- Başûra Kurdistanê piştî avakirina rêveberiya sînemayê: . Roja avakirina rêveberiya sînemayê heta roja îro nêzî 24 mîlyon Dolar alîkarîya sînemaya Kurdî hatîye kirin. Her wiha piştê ku ev alîkarî hatine kirin gelek filmên baş ên Kurdî hatine çê kirin ku gelek ji wan filman di fîstîvalên filman ên cîhanî de gelek xelat wergirtine û bi vî pereyî li Kurdistanê jî gelek Fîstîvalên Sînemayê hatine lidar xistin. Ev cîyê şanaziyê ye bo me ku Kurdan karibûye bi wî pereyî dengê xwe di nava Sinemaya Cîhanî de bidin. Di hemî fîstîvalên cîhanî de filmên Kurdî jî cîyên xwe bi vî awayî girtine. (hevpeyvîn: Şaxewan Mistefa)

BEŞA DÛYEMÎN

2. PEYWENDÎYA SÎNEMAYÊ BÎ WÊJEYÊ RE

2.1. Peywendiya Sînemayê Bi Wêjeya Cîhanê Re

Sînema wek hunereka bilindkarî di heyameka kêma de, bi awayekî xurt ber bi pêşvebiçe, giringritin xal di dinyaya sînemayê de sûd wergirtine ji hemû pajên (beş) wêjeyê, herwiha wekî alavek jî hat bikaranîn, her çiqas di her qonaxên cuda de hinek guhertin tede çêbûn û bi awayekî taybet pêşket, bêguman ev qonax jî bi xebata kesan û hunermendan avabû, êdî gav bi gav sînema bûye pişse û ev pêşketin jî roj bi roj di geşekirin û berdewambûnê de ye. Di seretaya peydabûna hunera sînemayî di demeka kin de gelek sûd ji pajên cur bi cur ên wêjeyê wergirtine, bi taybet di warên şano û romanê de, ev pêwendiya di navbera sînema û wêjeyê de bûye sedema hebûna nîqaşên ji hev cuda yê şarezayên sînemayê, loma kes nikare vê pêwendiyê bi baldarî û kûrî destnîşan bike, an naveroka dawî ya vê pêwendiyê dasaz bike, ji vir pêve em têdikoşin ku bala xwe bidin ser van nerînên cuda. (Davîed Dicîz, Şêwahayî Neqd Edebî, Werger Mihemed Sibikyanî, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, R,42.)

Di derbarê van pêwendiyên di navbera sînema û wêjeyê de heye, bûye sedema cudahiyan fikirî di navbera pisporên warê sînemayê, her yek ji wan bi awayekî li ser vê pêwendiyê dipeyîvin ku bi awayekî giştî di xizmeta sînemayê de dibin. Loma hinek ji pisporên sînemayê wiha dibînin sînema hengî digîje lûtkeya serkeftinê ku li ser deqên wêjeyê bisekine, hergav ev pêwendî wê bi wêjeyê re qût bibe an lawaz bibe hengî sînema jî ber bi xerabûnêve diçe, sînemayên welatên cîhana sêyemîn rastî vê yekê hatine, ango wan pisporan wiha dibînin ku pesindtirîn filîmên sînemayê ew film in ku li deqên wêjeyê hatine wergirtin û senaryo jî piştî hinek kêmkirin û zêdekirinê ji deq an jî romanekî ve hatine wergirtin, lê ji aliyekî din hinek ji pisporên sînemayê wiha dibînin ku film an filîma sînemayê, ew sînema ye ku senaryoya wê rasterast ji bo filîmê nivîsandin û senaryonivîs jî vê deqê tenê ji bo vê filîmê berhem aniyê

Pirraniya nerînan di vî warê de bi nêzê nerîna yekemîn in, lê ev nerîn bi awayekî din vê pêwendiyê dibîne û li gorî vê nerînê be jî wergirtina senaryo ji deqa wêjeyê û kirina wê, bi

filîm careka din ev deq vedijîne, li gorî vê nerîne wergirtina senaryoyê di deqên dî dibe sedema ku vê deqê di hiş û hizra bîneran(temaşevanan) de bimîne, loma girîng dibîne ku deqên wêneyî bibin filîm, yeka din di van nerînan de vê pêwendiyê giring dibîne, lê di heman demê de li gorî vê nerîne dema deqeke wêjeyî tê guhertin ji bo senaryo an ji bo deqa derhêneran wê demê ji deqa resenî ya xwe cuda dibe û deqeke din saz dibe ku taybet dibe bi sînemayê re, ev deqa nû jî bi derhêner re vedigere û dibe çîrokeke din a derhêner, herhal sînema ji seretaya sazûna wê ve pêwendî bi wêjeyê re heye, lê ev pêwendî çawa çêbûye, bi kurtasî têdikoşin ku çawa û gavên çêbûna vê pêwendiyê zelal bikin.

Sînema di serî de ne çîrok û ne mijara wê hebûye, belkî tenê aramca wê nişandina dîmenan bûye bi şewaza vîdeoyî, ev jî tenê ji ber nişandana cadûyî (sîhrî)ya vê babet û mijara nû di nav xelqê û di holên sînemayan de, nişandana hinek dîmenên livî bûn, wek: kişandina kolanan û hatina tîrên ber bi stana xwe û karên rojane ya xelqê û nişandana reqs û van dîmenan, ji vê cûreya sînemayê re dibêjin: sînemaya Belgayî ango: Veguhestina rastî û diristî ya jiyana xelqê ji bo perdeya sînemayê. (Reza Elî pûr, Edebyat û Sînema, Govara Film, Jimare 4 ,Weş. Rêveberya Sînemayê Silêmanî, Silêmanî Temûz 2010, r.20-21)

2.1.1. Kesên Yekemîn Ku Sînaryo Bo Sînemayê Afrand û Ji Çiqên Edebî Sûd Wergirtine

Fîlmsazên yekemîn bo sînemayê ji babetên curbicur sûd wergirtin wek mînak: ‘Şano,wênegirî ,nûserî , cadugerî -sêhrî, lêbokî) ev babetên ku nû natin nav sînemayê bûne alavek bo berdewamiya wê, piştî ku bînerên wê kêmbûn ve carê derhêner neçar man û piştî vê neçariyê wan babetên me li jor diyarkiriye bikar anîn ku yek ji wan jî ‘Çîrok’ bû.

Yekem kesê ku karibûye li ser binyata çîrokekê (çîrokeke kurt a ku hatiye wergirtin) filmekê çê bike ‘Georges Mîlîes’ bû. Wî di sala 1899ên zayîne dest bi çêkirina filmekê kir ew jî bi navê ‘Serhatiya Drîfusî’ çîroka evserekî navdar ê arteşa Frensî bû ku bi Sîxurî (Casûs) hatibû tometbarkirin wî bo xwe careke dî ev çîrok hunand û kir filmeke 15 deqeyî. Xelkê gelek bi germî pêşwazî ya vê filmê kir û ev yek bo fîlmsazên dî jî bû sedema çêkirina filmên nû ku wan jî bi çîrok û babetên edebî film çêkirin. Evîna mirovî û hezkirineke berfireh bo bihîstin a wan çîrok û serhatiyên curbicur , grîngitîrîn hokar e bo fîlmsazên yekemîn ê sînemayê û derhêneran jî piştî xwe bi van çîrokan germ kirin û wan sûd wergirtin ku dawiyê film çêkirin.(Mihemmed Xeyrî, Sînaryo,r. 29)

‘Mîlîes’ û fîlmsazên yekemîn ên sînemayê bi drustî zanibûn ku wergirtin yan jî îqtîbas alaveke bo hîlbijartin a babetên edebî û baştirîn jêder in bo wergirtinê . Wisa diyar e ku çîrokên hunandî û pexşanên cîhanî di yekem rojên peydabûna sînemayê da dirist wekî niha , mezintirîn çavkanî û îlham bû bo fîlmsazên ku nû dihatin nav qada sînemayê da . Navdarî û hêjabûn a van cure çîrokên edebî û başiya çêkirinê û pêşkêşkirina van filman

girêdayê bi wan ve, bixwe hokarên binecihbûn bo firotina wan filmên ku bi rêka wergirtinê ve ji edebî hatîn hilgirtin herwiha bo vegera bîneran û rê vekir bo avabûna sînemayê ser ji nû. ‘Mîlîês’ piştî çêkirina filma ‘Serhatiya Drîfusi’ dest da çêkirina çend filmên di her bi rêka wergirtin ji berhemên edebî yê wê serdemê kir, wî di sala 1900an de filma ‘Sindrêla’ çêkir ku ji çîrokeka navdara li dor perîyan hatibû wergirtin . Di sala 1901ê de berhem anî bo film a ‘Sefer Derbe Mang’ ku filmeke kartunî ya komîk bû û ji çîrokeka zanistî ya ‘Jul Vêrnî’ hatibû wergirtin . Du sala piştî hingê, ‘Mîlîês’ î hindek filmên di , wekî ‘Seferên galvêrî , Robînson Kirûz û Nîfrîn fawsit’ î çêkirin, ku her yek ji wan jî ji berhemekê edebî hatibû wergirtin û serbarî hebûna xeyal di çîrokê da. Çêkirina van cure filman bû egerê hindê ku dîsa sînema wan bînerên xwe bikêşê nik xwe.(Seid Şimî, El Sure El Sînemaiye Min El Sînema Samte îla El Reqemye,r.85)

Hevdem digel çalakiyên sînemayî yê Mîlîês î li frensayê, hewlên dîtir jî li welatên îtalya, Înglîz û Emrîka dihatin dayîn bo hîlbijartina babetên ji jêderên cur bi cur her wiha bi rêka wergirtinê mifa ji berhemên edebî hat standin.

Li Înglîztanê flîmsazên wan dest avêtin çêkirin a filman ku çîrokên wan ji babetên gunehbarî û polîsî yê rojane dihatin wergirtin û jêderên sereke yê van babetan, raportên belavbûyî di rojnameyên wê demê de bûn. Li dûvçûn û ji revîna van renge filman û hestiyarbûnên veşartî li pişt van renge serhatiyên bûye sedema xurt bo afirandin a dîmen ên dilhejîn û pirr bizav. Filmên wek ‘Dizîker bigirin, Rêgiriya dilêrane di rojeke ronahî da, Talana dilîcan pistî) hindek nimûne ne ji van renge filman.

Li îtalya hewla flîmsazan bêtir bi piştgermiya çêkirina filman bû bi rêka sûd wergirtinê ji nivîsên dîrokî û afirandina mijarên mezin û berfireh ser perda sînemayê.

Di sala 1908an da dû flim di demekê da hatine berhemînan, ew herdû film jî ji şanonameya ‘Hamlêt’ ya şanonivîsê navdar ‘Wilyam Şekspîrî’ hatibûn wergirtin. Her li vê salê ji bilî van herdû filman filmeke di li welatê Îtalya hate berhemînan ku ji romana navdar a ‘Kînt Munt krîstuv’ ya ‘Aleksandir Dumas Pere’ hatibû wergirtin û ev film ji dîmenên pirr heybet ên dîrokî di sînemayê de hat pêşkêş kirin.(Înca Karînkufa, Kîf Titim Kitab El Sînyo, Werger Ehmed El Hizrî, Weş. El Heya Elama Lişiu Elmtabih El Emîrye, Mîsir 1999, r.11-15)

Li sala 1910an da jî filmeke di bi navê ‘Hamlet’ her li Îtalya hat çêkirin, ku sêyemîn wergirtina sînemayî ya flîmsazên Îtalî bû ji vê şanonama navdar. Berhemînana van renge filman ji nav babetên dîrokî pêdivî bi ‘Dîkorên pirr xerc e leşkerek xeyalî’ hebû .

Di sala 1913an da flîmsazên Îtalî film a ‘Dê kî ve biçî?’ ango ‘Hewasên Împratorî’ ku ji romana navdar ‘Hênrî Sînkuyç’ î hatibû wergirtin û çêkirin ku bi germî pêşwazî lê hat

kirin . Filmeke dî yê mezin ku sînemaya hingî ya Îtalî berhem îna, filmê ‘Kabîrya’ bû ji derhênan a ‘Cuvînî Pastrunê’ ku di sala 1913an de hatibû çêkirin û ji nivîsîn a ‘Gabriyl D.anunziw’ hatibû wergirtin. Ev film jî ji film a ‘Dê kî ve biçî?’ mezintir bû, bandoreke mezin li sînemaya welatên dî da û bi taybetî jî li karê flimsazên mezin ên wekî ‘Dêyvîd Wark Grîfs’.

Piştî Georges Mîlîes bînerên wî kêmbûn li Fransayê li Emrîka kesekê dî peyda bû bi navê ‘Êduyn S. Porter’. Porter di sala 1896an heta 1900î bi amûreya ‘Wîtaskop’ li Newyork flim pêşkêş dikir. Porter wek mîkanîkarekî li kompanyaya Edîson hat wergirtin, paşê wek wênegir û derhêner dest avêt çêkirina filman. Di serî da filmên wî pêkhatibûn ji rûdanên rojane, porter piştî çêkirina gelek filman û peyda kirina ezmunek a mezin li sînemayê karî bo cara yekem kamîra sînemayê di nav çarçoveka girêdayê bîne derve û montaj bo sînemayê bi afirînî her wiha karî bo cara yekê bi alikariya montajê ve çîroka sînemayî vegêrit. Navûdengitirîn filma wî ‘Jiyan a Agir Vemrêneka Emrîkî, Diziya Trên a Mezin’ bû, bi taybetî ‘Diziya Trên a Mezin’ bi dest pêka çîroka realistî li sînemayê têt pênasekirin çimkî cudahiyeke mezin hebû li gel filmên xeyalî ya Georges Mîlîes her wiha ev flim zêdetirîn pare bidestxist li wê demê da bû sedama wê yekê ku kesên zengîn hizir bikin para xwe bo sînemayî bidin ango xerc bikin.

Hemdem li gel karên ‘Porter’ î kesek dî hat nav sînama ya Emrîka ku ew jî nûser û derhênerê mezin ‘Dêyvîd Wark Grîfs’ bû. Grîfs bi diristkerê ‘Holyodê’ bavê teknîka sînamayê, pêkînerê zimanê sînemayê tê hejmartin, ew kesê ku xeta cuda ya navbera sînema û şanoyê çêkir.


‘Girfîs’ di serî de nivîskar bû, yekem deqa şano ya xwe di sala 1907an da firot rojnameya ‘Waşinton Dî Sî’ belam serkeftinek bidest nexist. Piştî belavkirina çend kurteçîrok û helbestan li rojname û kovarên wê serdemê, pêşniyaz hat kirin ku sînaryo bo sînemayê binivîs e, di serê da Grîfs ev pêşniyar qebûl nekir, çimkî sînema di we demê bi di çavên kesan de picûk dihat dîtin.

Yekem karê Girfîs î di sînemayê de ligel derhêner Porter î bû, Porter pêşniyar bo Girfîs kir ku li derhênanê filmeke bi navê ‘Derbazbûn Di Hêlîna Helo’ de bibe alîkarê wî û di heman demê bibe listikvanê wê filmê, Grîfs jî bû listikvanê wê filmê. Piştî wê filmê Grîfs berê xwe da kompanya ‘Byograf’ î û bi xwe û komek sînaryo di destê wî de ku ewin sînaryo bixwe nivîsibû, li vir wek listikvan û nivîsarê sînaryoyê dest bi kar kir. Di 5 salan da 450 kurte film bo kompanya ‘Biyografi’ çêkirin û bû xwedî ezmuneke mezin di sînemayê de. Grîfs di wan 5 salan de gelek deqên edebî kir film.

‘Grîfs’ ê ku karê xwe bi bizar kirinê dest sînemayê kiribû, di sala 1908an da dest avêt berhemîna filman bi rêka jêderên cur bi cur ên edebî, van berhemên edebî ku têkelî rihê Grîfsî bibû, bû sedem ku gelek ji deqên Şekspîr, ‘Alan Po, Tnîspin, Çarliz Dîkinz, Tolstoy, Tomas Dîksonî’ û çend nûserên din vegêrît bo sînemayê her wiha teknîka roman û delaliya çîrokên vediguheze nav sînemayê, hewlên wî ya herê bihadar hilbijartin a çîrokên cindî bû ku ew jî bi bu cihê balkêşiyê bo temaşavanan.

Di sala 1908an da filma ‘Boxatra Avîna Bi Zêrî’ ji çîroka ‘Pirtoka Goştî’ ya ‘Cak London’ î berhemîna û paşê derhênanan a filmê ‘piştî çendîn salan’ ji pirtûk a ‘Enux Ardin’ ya nûvser ‘Tinsîwn’ î kir.

Giringiya karê ‘Grîfs’ î ne di van filman bi tenê di filman de ye, belkî di derhênanan çendan filmên mezin û pir mezaxtin da ye, ku yekemîn ê wan di sala 1913ê bi navê ‘Cudêt Xelkê Beytu Llehme’ ji ‘Pirtûka Pîroz’ hatibû wergirtin û di çar beşan da berhem îna. Ev jî bersivê bu ku Grîfs dida filmê ‘Dê kî Ve Biçî?’ yê Îtalî. Ev film li dezgehê ‘Byograf’ hatibû berhemînan, ji ber ku zêde pere lê hatibû mezaxtin, vê dezgehê hevkarîya xwe digel Grîfs î birî.



D.W. Grîfs filmsazê kû bi jîriya xwe gelek babetên belkêş ên edebî kir nav sînemayê da.

Piştî ji hev veqetîn a ‘Grîfs’ î û dezgeha navbirî, ew î hizir di berhemînana filmekî da kir sebarete bi şerên navxweyî yê Emrîka û piştî xwe bi çîroka ‘Tomas Dîkson’ î germ kir, hinek wêne û name û belgenamêyên ji şer man, pêngava dest pekê avêt bo berhevkirina navdartirîn filmê xwe. Encama vê hewlê filmek bû ku nave wê ‘Ji Dayîkbûna Miletêkî’ bû ku ev flim di sala 1915an de hat pêşkêş kirin û pereyekî zêde gehand berhemhêner ên filmê, serkefitneke mezin a bazirganiyê bi dest xwe xist.

Flimsazên dî ku hevdem digel Grîfs’ î yan piştî wî hatin nav qada sînemayê, her yekî şêwazek li ser şêwazên çêkirina sînemayê zêde kirin û berhemînana filman mifa wergirtin ji

berhemên edebî û ev, bû alavek bo berhemhênerên filmên bazirganiyê, dê bi vê rêyê bişên rêyeke li wan ziyanan bigrin yên ku dibin sedema serkeftina aborî û hunerî. (Mihemmed Xeyrî, Sînyaro, r.30-35)

2.1.2. Peyva Îqtîbasê (Wergirtin)

Îqtîbas: Zimanên ku mifa ji zanîna hevdu werdigirin. Ferhenga 'Dhixda' wisa pênaseya peyva 'Îqtîbas' dike: "Îqtîbas' ango girtina agir, çimkî ev peyv jêder e û ji wateya 'Erebî 'Qbis = Gurya Agir' hatiye wergirtin, û wisa wateyên 'Ronahî wergirtin û ji kesekî fêrî zanîne bûn' jî didet, û wek zaraw (mistelh) ango di babetekê de mifa ji hindê ayetên Qur'an'ê yan hedîsan bête wergirtin bêyî ku ameje bi van jêderan bihête kirin".

Ferhenga 'Mû'în' jî ku ferhengeka farisî ya cihê baweriyê ye, derbarê peyva 'Îqtîbas' ê de dibêje: "Îqtîbas ango: Fêrbûn-wergirtin-mifa wergirtin ji kesekî-her wisa wergirtina ji pîrtûkekê yan jî nameyakê bi dest xistiy. Wek zarave ango bikarînan a ayetek a ji Quran'ê yan înan Hedîsekê, ji Helbestekî yan jî ji Pexşanekî de bêyî amaje bi jêderî bête kirin". (Mohemed Xeyrî, sînyaro, wergêr mis'ud xald, çapa yekamîn, weş. xanê, 2007 Dihok, r.10; Lînda Sînger, Filmname Îqtîbasî, Çapa Yekemîn, Werger Abbas Ekberî, Weş. Întîşara Neqş û Nigar. Tehran 1980, r.33)

Di zimanê Îngilîzî da peyvên 'Adaptation, Optaining, Acquiring' hevwater û hevraman a Îqtîbasê ye. Di zimanê Îngilîzî de peyva 'Adaptation' ji her dû yên dî zêdetir dikare ramana îqtîbasî bigire. 'Îqtîbas yan 'Adaptation' di sînemayê da ango wergirtina piçek ji huneran dî, şêwaz û babetên nasyar û serkeftî di hunrên dî da û danîn a wan di çarçoveyeke eşkere û nû tir e ku sînema bixwaze.

Her wekî dihête dîtin rêkên îqtîbasê bo filman gelekî û ji ber ku sînema hunereke nûtir e ji hunerên dî, ji ber hindê sînema şiya mifa ji hemî hunerên dî werbigir e û wan bike bin xizmeta xwe. (Seyd Filîd, Çewa Filimnamê Binvîsîn, Wer. Ebas Akbirî / Mis'ud Midnî Weş. Nşir Saqî, Tihiran 2013, r.16)

2.1.3. Şêwaza Wegirtina (Îqtîbas) Daqên Edebî Bo Sînemayê

Di dabeşkirina wergirtinê de ji bo deqeke edebî sê metodên sereke hene. Em ê jî behsa van hersê cureyên wergirtinê bikin û mînakên wan vebêjin di edebiyatê de.

2.1.3.1 Wergirtina Azad

Di vê cureya wergirtinê de nûserên sînyaronivîs dema deqekî werdigrin bi şêwazeke giştî îddayeke, kesayetî yan jî rûdawek ji çavkaniyên edebî werdigre û bi şêwazeke serbixwe bi vegotîneke nû û can: Cihên nû, kesên nû, demên nû ji dinyayeke cuda ji deqên serekî bikar dianîn. Heta niha di sînemaya dinyayê de bi şêwazeke cuda sûd ji wê cureya îqtîbasê ya azad dihate wergirtin. Mînak em dikarin behsa anîmasyonên (Paşayê Şêr) ku di sala 1994an hatiye

çê kirin ku yek ji baştirîn û balkêştirîn film e ku wek baştirîn berhema sînemaya cîhanê tê zanîn ev berhem jî pêktê ji têgihêstinek e azad ji şanoname ya Nasrawa hamlet a Şekspîr. Di wê berhemê de ciyawaziyeke mezin heye di navbera deqa resen û berhema ku îqtîbas lê hatiye wergirtin ku di berhema îqtîbas kirî de behsa dinyaya efrîqî û dinyaya ajalan dike ku rastiyê de ango di şanonameya Şekspîrî de tişteke din yan jî dinyayeke din e. (Robert Mikki, Dastar, Saxtar, Sibik Û Usul, Film Namanuîsî, Werger Mihemed Gizîr Abadî, Çapa Dûyemîn, Weş. Hirmîz, Tehran 1985, r.25)

Ji bilî vê em dikarin behsa çendin mînakên din jî bikin: ‘‘Sanrîkin’’ berhema Fîdrîko Filînî ye ku ew berhem jî ji çendan sahneyan pêktê ku nêzikayiya wî digel Şa’irê mezin ê yewnanî ‘‘Pitroniyos’’ heye. Ev berhem jî hêla plan, dîmen, rîtm û wêne deyndarê vî Şa’irê Gewre ye. Her wiha filma ‘‘Havîna Germ a Dûr û Dirêj’’ ku berhema ‘‘Martîn Rîp’’e ji rûdaweke ku ji berhema Hamlet a Şekspîr hatiye wergirtin pêktê. (Martîn Elîsin , Nimayîş Çist? Werger Mihemed Şihba, Çapa Yekemîn, Weş. Binyad Sînani Farabî, Tehran 1976, r.45 ; Kawe Eweysî, Îqîbasî Edebî Le Sînema Da, Govarî Film, Weş. Rêvebeya Sînemayê Silêmanî, Silêmanî Temuzî 2010, Jimare 4, r.35)

2.1.3.2. Wergirtina Bi Wefayî

Nûserên sînyaroyaya îqtîbasî hewl didin ku rihê deqa resen biparêz in, heta ku karibin berhemeke edebî di çarçoweya sînemayî de bidin e xuya kirin. ‘‘Endere Bazen’’ rexnegira Frensî a bi navûdeng dibêje ku: Wergirtina biwefayiyê wek wergêrekî dibîne ku têdikoşe heta werdigre ji bo berhemeke sînemayî hewl dide ji çarçoweya deqa resen dernekeve. (Robert Mikki, Dastar, Saxtar, Sibik Û Usul, Film Namanuîsî, r.25)

Biloston di ravekirineke girîng a xwe de bi navnîşan a ‘‘Roman Di Çarçoveya Sînemayê’’ de dibêje: Wergirtina biwefayî di bingeha xwe de berhemeke resen e. Eger derhêner bîroka(Hizr), kesayetî û şewaza romanê jî biparêze wê demê ev rêgezên han hêj jî wek amûreyeke xav (Seretayî) a filmê xuya dike/in. Kawe (Eweysî, Îqîbasî Edebî Le Sînema Da, r.35)

Di vê cureya wergirtinê de zedê nêzikê deqên edebî dibe ku temamê hewl û têkoşîna filîmsaz û îqtîbasker ji bona parastina deqên edebî ye di şewaz û naveroka berhemê de. Berhema edebî bi şeweyeke sînemayî ji bo bîneran bidet xuya kirin. Filma Korî(Kore) ‘‘Kor, Kwîr’’ ji aliyê ‘‘Ferdînannd Lomyerlîs’’ ku ji romana ‘‘Kwîr’’ a ‘‘Josê Saramago’’ wergirtiye. Davîed Dicîz, Şewahayî Neqd Edebî, Werger Mihemed Sibikyani, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, r.28)

Mînakek ji wê cureya îqtîbasê ye. Di wê berhemê de kesayetî û rûdawên romanê bi şewazeke biwefa wergirtiye û karibûye rihê wê berhema edebî nîşanê bîneran bide. Derhênerê serkeftî

an jî wergirê serkeftî ew e ku li gor şêwaz û taybetmendî, şêwazên Nûser diparêze û lê zêde dike. Di vê axaftinê de roman-film ne du deqên ji hev cuda ne di gelek cihan xalên hevbeş hene di navbera wan de em dikarin bibêjin du deqên temamker û yek in mirov dikare bi temaşekirina yekê an jî bi xwendina yekê ya din bibîne. Filma 1984, "Maykil Ratfor" ku yek ji mînakên vê cureya îqtîbasê ye ji kitêba "Georges Milies Orwil"î wergirtiye. Ev film jî bi heman şêwazkariyê ye ku şêwe û naveroka berhemê edebî parastiye. Raman Sildin, Rehnameyî Nezerî Mahasir, Werger Abbas Mixbir, Weş. Întîşar Terihna, Terhan 1984, r.50)

2.1.3.3. Wergirtina Peyv Bi Peyv

Ev cureya wergirtinê taybetî ji bo wergirtina şano, çîrok û kurteçîrokê ye. Ew nûserên ku di vê qadê de kar dikin hewl didin ji bo parastina hemî aliyên berhemên edebî di berhema xwe de. Hoca Nesreddîn Tûisî, Esas Îqtîbas, Werger Medresa Rezwa, Weş. Muesese Întîşarat, Çap. Tehran Tehran 1961, r.62)

Di rastiye de qet guherîn di berhemê de çênabin an jî ew çênakin belkî hewl didin wê berhema edebî bi hale wî yê resen biguherînin ji bo filmeke sînemayî. Filma "Jina Siyapoş" mînakek ji vê cureya wergirtinê ye ku Derhêner "Sîdnî Lument" e. Ji şanonameya "Yûcîn Ewnîl" hatiye wergirtin. Her wiha filma "Kî Ji Vîrcînya û Wolf Ditirse" bi derhêneriya "Maykil Nîkûliz" derketiye pêşberî bîner. Ev berhem ji şanonameya "Edward Albi" hatiye wergirtin. Komeleya wergirtinê ya navûdeng a "Lorans Olîviye" ji şanonameya Şekspîr hatiye wergirtin. Ev berhemana ji wan filmên serkeftî ne ku li gor vê cureya wergirtinê hatine çê kirin. (Eweysî, Îqtîbasî Edebî Le Sînema Da, r.36)

2.1.4. Wergirtin Di Bingeha Çêj û Tam A Dîtina Filman De Ji Aliyê Temaşevanan Ve

Diyar e ku di kirdarên wergirtinê du tişt hene. Ya yekem ew e ku îqtîbas jê tê wergirtin ya duyem jî ew e ku îqtîbas wergirtibe. Bi wateyeke din ew deq û nûsîn ku îqtîbas jê tê wergirtin jê re Bexşer tê gotin. Ya duyem ku kirdarê îqtîbasê di deqekî de kiriye dibêjinê de wergir. Di vê peywendiya ku di navbera van her du toximan de heye pênaseyên îqtîbasê tîne pêşçavên me. (Davîed Dicîz, Şêwahayî Neqd Edebî, Werger Mihemed Sibikyanî, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, r.31)

Pêwîste her behseke di derbarê îqtîbasê de tê gotin behsa wê yekê bike ku di îqtîbasê de çi çê dibe? û pêdiviya behsa wê yekê bê kirin ku em bo çi sûd ji îqtîbasê werdigrin? Gelo îqtîbas karek e? Karê îqtîbasê (Wergirtin) wekî cureyên karên di mirov neçarê karekî dike. Kesê ku wî karî dike xwedî mabest e. Bo mînak, ew kesê ku deqekî ji bo îqtîbasê hildibijêre û biryar dide ku beşek ji wê deqê îqtîbas bike, ewilê ev kar hizrek e di hişê wî de pişt re biryarê dide ku ew bîryar jî biryarek e hişyarane ye û digel wî jî armanceke wî heye. Ev çêsn wisa dide xuya kirin ku îqtîbas(wergirtin) xwedî panteyiyeke(firehbûn) mezin e û em, neşên bi peyvekî

pênaseya vê yekê bikin ango wê kurt bikin. Cureyên îqtîbasê û Peywendiya di navbera wergir û bexşerê de. Jolî Sandirs di pirtûka xwe ya ‘Îqtîbas û Tehasup’ ku ji wan dabeşkirinan ya herî mezin e, di derheqê îqtîbasê de ku wî jî dabeşkirina xwe ji Dîbora Kartmel wergirtiye. Li gor vê pêwendiyê îqtîbas dibe sê celeb: Îqtîbasa veguhastinê, Îqtîbasa ravekirinê û Îqtîbasa berewurdî. (Robert Coldwotêr-Marko Trîfis, El Fen Vel Fenanun, Werger Dr. Mistefa Hadî Conî, Metebeq Hey El Misrîye El Amme Lilkitab, El Eskenderîye 1997, r.41-42)

2.1.4.1. Wergirtina Veguhastinê

Ev dabeş kirin deqek ji cureke edebî tê wergirtin, bi şêwazeke ciwannasî û îstatîkayî diguhezire ji bo sînyaroyaya filman, pêşkeşî bîneran tê kirin. Mînak: Mîrov deqa romanekî diguherîne bo filmekî ji vê re jî Îqtîbasa veguhastinê tê gotin. Ev veguhastin nayê wê wateyê ku roman veguhuziye ji bo sînyaroyê belkî ji gelek aliyan ve hatibe vehuhestin ku ev aliyên cografî, kulturî û dem guherînên ji deqên resen in. (Davîed Dicîz, Şêwahayî Neqd Edebî, Werger Mihemed Sibikyanî, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, r.28)

Mînak: Fîlma ‘Romeo û Jûlyet’ ku berhemeke’ Wîlyam Şikspîr’ e ji aliyê derhênerê mezin ‘Lorman’ ve bibû film da. Mînakeke berbiçav e ji bo van gotinên me. Di filmê de hewl daye ku cih û demên nû bikar bîne ku ev yek jî berevajî ji berhema şekspîr e ango cih dem cuda ne. Jê pê ve di şûna şûran de jî çekên nû bikar anîye. ‘Jîra Jênt’ di derbarê vê yekê de dibêje: ‘Ji vê kirdarê re livîn a berbi nêzîkbûnê tê gotin’ Îqtîbasa Veguhastinê dema ku ji bo deqeke edebî diguhere bo sînyaroyeke sînemayî ji gelek aliyan ve guherîn çê dibe: di kulturê, erdnîgariyê û demê de. Bi wateyêke din dema ku deqeke edebî dibe mijara filmekî li gorî îqtîbasa veguhezinê, em dikarin guherînan li kultur, erdnîgarî û demê re çê bikin. Em dikarin ji bo dirust kirina filmeke sînemayî sûd ji deqeke edebî werbigrin û gelek guherînan lê çê bikin. Belam divê ev guherîn bi şertekî çê bibe ku ew jî xwe nêzîk girtina reseniya berhemê ye ango ji dûr neketina reseniya berhêmemê ye. Ji bo vê cureya îqtîbasê berhêmemê Şekspîr ‘Hamlet, Othello mînak in. (Davîed Dicîz, Şêwahayî Neqd Edebî, Werger Mihemed Sibikyanî, r.29)

2.1.4.2. Wergirtina Ravekirinê

Cureya îqtîbasê a duyem e. Di van cureya dabeşkirinê de kesê ku deqeke edebî diguherîne xwe ji nêzîkbûna sade dûr digire û xwe nêzî diyardeya kulturî dike. Ev cure îqtîbas milbimil digel raveya sîyasî ya deqê û çavkaniya deqê diçe di heman demî de guherînê jî li deqê dike. Di îqtîbasa raveyê de gelek aliyên ku dişibine hev di navbera deqê resen û sînyaroyên ku nû hatine dirust kirin de hene. Di vê îqtîbasa raveyî de hewl didin ku li gorî deqên resen zêdetirîn bandorê li bîner bikin û bandorê bikine li ser vê agahiya ku haja bîneran li vê deqa

resen heye. Ji ber vê yekê di vê cureya îqtîbasê de bi şeweyeke serekî sûd ji wan deqan tèn wergirtin ku gelek bi navûdengin. Di heman demî de eger guherînek di deqa resen de hebe digel deqên nû ji aliyê bîner ve bi hêsanî tê dîtîn. (Davîed Dicîz, Şewahayî Neqd Edebî, Wer. Mihemed Sibikyânî, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, r.28; Balas Martîn, Nezerîya Hay Rîvayet, Werger Dr. Mihemmed Şahabe, Întîşar, Tehran 2012, r. 50)

2.1.4.3. Wergirtina Berawurdî (Hemberkirin)

Cureya sêyem a dabeşkirina Kartmel e. Di vê cureya îqtîbasê de agahiya temaşavan qels e. Mînakên vê cureya filmê ‘Ev e Axir Zeman’ bi derhêneriya ‘Fransico Ford Capola’ ye. Ev berhem jî ji romana ‘Dilê Tariyê’ ya ‘Jozef’ hatiye wergirtin. Dîmenên vê filmê li Vîetnamê hatine girtin lê di romanê de cih bixwe Kongo ye. Ji ber hindê film li ber çavê bîner xerîb xuya dike beravajî wê romanê ku film lê hatiye wergirtin di heman demî de filmê çêja xwe daye. Xala girîngiya wan de beş kirinan (Îqtîbasa veguhastinê, Îqtîbasa ravekirinê û Îqtîbasa berawurdî) bi me didin xuya kirin ku berhemên îqtîbasî çî bandorek li bîner kiriye û di hemî pênaseyên ku me di serî de behs kiribû bîngeha çêj û tam a dîtina filman hatiye pêşçav kirin ji aliyê temaşevanan. (Raman Sîldin, Rehnameyî Nezerî Mahasir, Werger Abbas Mixbir, Weş. Întîşar Terihna, Terhan 1984, r.60; Walas Martîn, Nezerîya Hay Rîvayet, r.50). Li gorî Jan Albîs îqtîbasên deqên edebî dibe sedema dirêjbûn û zêdebûna lezetê. Bi taybetî diguherine bîngehên deqê. Albîs dibêje ku îqtîbas kirin di berhemeke edebî de amûreyeke ji bo berdwamî û çêjên berheman. Dubare kirin û çê kirina wê berhemê çêjeke xweş e. Îqtîbas sûd ji bîrhateyên romanekî werdigre ku ew bîranîn jî ji xwendina romanekî çavkanî tê girtin yan jî hewla reşkirina wan bîrhateyên klasîk didet yan jî hewl dide wan bîrhateyan di rêka wênegirtinê ku careke din zindî biket. (Afreîm Lîsîg, Gutihalît Dramatolojî, Hamburg, Werger Azabarî, Weş. Fasilname Teksir, Hejmar 39, Tehran 1984, r. 33...39).

2.1.5. Wergirtina Deqên Edebî û Guhartin Bo Sînemayê

Peywendiya di navbera deqeke edebî û sînoryayeke heman deqê peywendiyeye wê ya tevlihev heye. Bi watayek dî ,dadvaniya baş û xerab li gor yek ji van deqan heq nade me ku em bibêjin ev baş e yan jî ew baş e. Mînak zêde flim hebûne serbarî ku serukaniya afirandna wan deqekê bihadarê edebî bûne , lê flim xwe jî ji agahiyên sînemayî bê bahir nebûn. Ê dîsan hindê flim lipey deqên edebî yên navnicî hatine berhemînan û şiyane baştir hayên sînemayî û hunerî bi dest xwe bixin.

Li gor axaftina piraniya nivîser û flimsazên desthelên sînemayî ew e ku edeb bi rêka nivîsînê û gotarên hizrî û beraqil, dergehê peywenê di gel xundevanên xwe vedikin, lê ev peywendiya di sînemayê da bi rêka wêne û nîşandana rûdanên ku her gavê da kartêkirinê li bînerên filmê diket û hesta wan yan dilînî 'atfî' diazirînit. Lewra heger pirtûkek ji layê edebî ve ya serkeftî

jî bit, merc nîne di hemî wergirtinên sînemayî da heman serkeftinê bi dest xwe ve bînit, ew naçare ku şêwazek dî bigirte ber xwe, ku ew jî şêwaza piraniya dema dijî şêwazên edebî ye û bi naçarî dest ji gelek ciwankariyên edebî berdet. Û dîsan ji ber van têbînî yên hunerî ye ku gelek kê m hildikivît pirtûkeka edebî ya serkeftî bişê sed ji sedê hokar û piştevanê berhemînana filmekê sînemayî bit û hevdem li cem wefadariya temam ya deqê edebî jî bête parastin. (Robert Coldwotêr-Marko Trîfis, El Fen Vel Fenanun ,r.100-105).

Helbet eve nayet wê me'nayê ku heger deqekê edebî bibe filim, filmê berhevbûy dê berhemekê kê m bihatir bit ji deqê edebî bi xwe , belkî pêtiyve bi bêjin flim berhemekê nutir e ku li heman ast û bihadariya berhemê edebî bimînit yan hêjî jê bilintir û êvetir biçit, lê di formekê nûtir û şêwazekê diyarkirineka cudatir da. Sînema û edeb dû zimên ji hev cudane, ku hêmayê sînemayê 'wêne' ye û yê edebî 'nivîsîn'e. Çu car sînema li duv rê.a û yasaya rêzimana zimanê edebî naçit û bi tenê peyrewîya binge hên serekî yên zanista hêmanasî yê diket , ku serkeftîrîn û tekuztirîn 'kamiltirîn' şêwazê veguwastina her ragendinekê dihête hijmartin. (Mihemmed Xeyrî, Sînyaro , r.47)

Sînema û edeb wekî dû dezgehên serbixwe yên hunerî, xwedî şiyânên gelek berfireh in, ku li hindê cihan ev şiyânên wan wekhev in. Derfîner bi ramana xwe ya taybet û paşê bi harîkariya kamîra girtinê rastiye hildibijêre da bişê ew tiştê ku wî divêt baştir destînîşan biket û yê dî hemiyê bide alîkî. Di vê karê xwe da flimsazî şiyân yên heyî li her demekê ku bi pêdivî bizanît ki nîşanana wêneyekî biçite pêşkêşkirna wênekê dî û wekî roman nivîsî hizra me ji dîmenên pirtir bi parçe dîmenekê bi tenê ve girê didat. Di heman demî de nîşandana pirçe dîmenan û rolgêrana zarvekirî, kamîreyan şiyân yên bi livîn ji cihekê bo cihekê dî, dîmenên berifrehtir bike ber çavên temaşavanên filmî û hêzeka gehşitî, hesta girêdayî royê zarvekeran, û parçe dîmenên girêdayî rolê wan hemî dîmen û tiştên têda eşkere biket. Ev e tişteke ku piçekê kê m yan zîde di romanê û deqên edebî jî da yê hey.

Serbarê vê çendê sînema û edeb ji layê corê tiştên ku di avahiyê çîrokên xwe da bikar dînin, wekî 'nasandina kesayetyan, nîşanana sinc û rewşa wan, hebûna arîşe û lêkefitnan, hilibijartina babeteke serekî bo çîrokê, pêşveçûna çêrokê, danana diltengî û hilawîstna' xwedî rûyekê wekhevin. Her çend mirov neşê taybetmendiyên wêne digel nivîsînê hevber biket, lê hendek aliyan ve bi temamî girêdayî hevdû dimînin û xwendevanê çîrokê yan bînerê filmê bi xwe ve girê diden.

Sêneyê ya şiyay bi rêka van şiyanan hindî deqên edebî 'yan hêjî zêdetir' di vegêran biçûktirîn babatên girêdayî çîrokekê da sirkeftî bit û şiya bi vê rêkê peywendîyeke nêzik, bi lez û rastî di gel bînerên xwe girê bidet.

Hejî gotinê ye ku ji bilî wan taybetmendiyan ku hatiye destnîşan kirin, sînema xudî taybetmendiyeke dîtir e ku bi hêsanî vegêranê di sînemayê da ya navdare û ev pîrse bixwe ya bûye egerê hindê ku lê nêrîna filmekî ji sehkirina şanoyekê yan xwendina pirtûkeke hêsantir û tenatir bit. Mînak, dema nivîskarek saloxên jorekî diket, xwendevan alîarî kiriye ji hizra xwe werdigirt bo tendarkirina ‘ticsim’ wê jorê . Lê di sînemayê da ev erke dikevite di sitpiyê filmî da û pêşî bîner bi rêka filmî wê jûrê dibînit dê aşkeratir û sadetir û bileztir bi ser saloxên jorê helbit, ev kare jî ji şîyanên edebî di derketî, ew tê ne ku nivîskar çendan ber pereyan bo saloxdanê destnîşan naket û wesa bigeht armanjên xwe.(Alain Morency, Eqtibas El Edeb Fî El Sînema, Werger Îdrîs Samîe, Weş. Camîa Abdulrehaman Mîre, Cezaiyr 1999, r.259-275)

2.2. Sînema Û Edebiyata Kurdî

Gelek ji bîrmendên sînemayê li ser vê yekê hevdengin ku sînema di hemû hunerên dî zêdetir têkel û grêdîyê edebiyatê ye, di sînemayê de hemû mijarê wî geriyane ji bo pênasikirina çîrokê, yanî karakter(lîstikvan) gotin û dîmen tev sembulekin bi van sembulan derhêner dixwaze tiştan bi temaşavanan bide naskirin, lê ne bi awayekî vekirî, bi awayekî sergirtî. Eger em berê xwe bidine dîroka sînemaya cîhanê, dibînin peşka zêde ji dîroka sînemayê bi dîmenkirin û wergirtina sûd ya ji roman û çîroka edebî ne, di wan welatan ku sînema têda bi hêz û diyare, edebiyat karîgeriyeka erênî li ser sînemayê daniye, yan alikariyeke raste rast kiriye li ser sînemayê, ji bo nimune rêya romana nû li ferensayê, prodîksiyonên mezînan senaryoyên xwe li ser berhemê edebî avakirîne, îro romanên ku bûne klasîk ji hêla her mirovî têne naskirin ji bo filîman bûne senaryoyên amadekirî, senaryo jî li ser bîngeha çîrokekê ava di bit. (<http://candname.com/sinema-kurdi-berxwedana-nermin/> / Izedîn Salih1 ,D.G , 2/6/2017)

Li cem me şîrîn bî yan tehil em wekî neteweya Kurdan neteweyeka bêy, edeb û romanîn , ewên ku heye jî di berhema komek ji şafrên mezînan in, eger ew jî nebana, metirsiyeka mezînan di hat ser zmana Kurdî jî, di edebiyata folklor û zarekî jî da tiştê zêde ku bişê bike rê girtine li hember ji navçûna zîman û şikeke ji kevneşopîya neteweyî, rewşa wênekêşanê û musîkê jî diyar e ew jî wekî hemî beşên dî dereng maye, bi sedema bindestî û nebûna desthelateka Kurdî, nebûne aboriyeka serbixwe û rewşeka azad, ji ber vê yekê em wekî neteweyeka bê roman û bê edebiyat û nivîsîna zêde, cihê tevliheviyê ye ku sînemayeka bi hêz me çênabe. (<https://didimn.com/sinemay-kurdi-têzlgay-chirok-culey-mirdu/> Çêner Bedrî, D.G ,12/11/2017)

Eger em vê rastiyê qebl biken ku sînema hunera heftê ye ew bi awayek hemî hunerên dî de hevra kom diket, dibe em bi wê yekê razî bin ku nebûna roman û edebiyateka bi hêz di dîroka Kurdan, nebûna xebatên ekadimî di wê mijarê, ew xebatên hene jî yan ne

ekadîmîne yan jî perçeyeka biçûke, ev hemî bûne sedema pêşve neçûna sînemaya Kurdî, Sînemaya kurdî jî sînemayeke derengmayî ye bi sedema ku welatê Kurdistan di nav çar dewlatên cîranê hevda hatiye parçekirin, ji ber nebûna welatekê azad a Kurdistan û hebûna astengên aborî û civakî û sîyasî, Kurdistan di warê sînemayê de bêpar man û di pêşveçûna sînemayê de dereng ketin, Kurd bi pirsgirêka azadiyê ra rû bi rû ne, di sînemayê de jî xwe ji vê yekê dûr naxin, êş û daxwazên xwe di her derfetêde derdixin pêşberî temaşavana, ev hesreta daxwaziya welatekî serbixwe û hewildan ji bo nasandina çand û nasnameyê xwe ye, yanî ji bo Kurdistan sînema nasandin û derdê xwe gotine. Eger em berê xwe bidin dîroka sînemaya Kurdî, dîrokeka lawaz û ji ya wê gelek kême

2.2.1 Peywendiya Sînemaya Kurdî Bi Edebiyata Kurdî re.

Eger em berê xwe bidine peywendiya navbera sînemaya Kurdî û edebiyata Kurdî, di gel hemî van astengiyên ku me behskiriye di xebata me da, dîsan jî derhênerên Kurd di wî warî da gelek kar kirine, gelek hewildan hebûye ji bo sûtîd wergirtina di edebiyata Kurdî, em bi awayekî dîrokî û bi awayekî kurt behsa hinek ji wan filîma diken ku çîroka xwe ji edeyata Kurdî wergirtine.

Di sala 1990an de, ji bo cara yekê hunermand û derhêner 'Mehdî Umêd' li welatê Rusyayê senaryo ji bo novel 'Gele Gurg an jî Koemk ji Gurgan'a 'Hisên 'Arif' dinivîse û hunermend 'Teymur Petayî' karê derhênanê ji bo we filîmê diket, di filîmê de şîyan kiriye ku çîroka wê novelê wekî xwe bide ber çavê temaşavanan lê belê serneketi ye, ji aliyê nûsera novelê û ji aliyê temaşavanan ve rastê gelek rexneyan hat.

Di sala 1991î, jî teksta hozanvanê mezin ê Kurdî 'Ehmedê Xanê' bi navê 'Mem û Zîn' kirine filîm li Kurdistanê Bakûr ji aliyê derhêner 'Umêd Elçî', ev filîme di bin bandora rêbaza xwe grêdan bi teksta hozanê şîyan kir, lê neşîya serkeftineke cihanî bidest bixe, ema di nav Kurdistan bûye cihê rêz girtinê ku wekî karekî mezin hat nixandîn.

Di sala 1993yan jî derhêner 'Şahîn Gök' derhênan ji bo filîmek bi navê 'Siyabend û Xecê' ku ji destaneke kevnare ya Kurdî hatibû wergirtin çêkir, wê jî xwe ji teksta destanê dûr negirtibû, mixabin ji ber ku profesyonelbûnek di wî warî de tunebû hunera filîm çêkirinê û tunebûna teknîkîyê zêde bû ji ber hindê kêmasî di filîmê de derketin.

Di sala 2005an de, derhêner 'Cemîl Rostemî' filîmek çêkir, bi navê 'Jiyana Gel' ku çîroka xwe ji romana nivîskarê mezin ê Kurdistanê Başûr 'Îbrahîm Ehmed' îna bû wergirtin, vê filîme di warê teknîk û aboriyê de cuda ji filîm ên dî baştir bû, her çend kete çend fîstîvalên cihanî de dîsa jî wekî filîmen dî ku me behsa wan kiribû, neşîya serkeftineke mezin dest bixe.

Di sût wergirtina edebiyata kurdî gelek derhêner şîyan kirine, ku bingeha senaryo ya xwe li ser çîrokan an jî romananan çê bikin, piştê wan deman li Kurdistana Başûr jî gelek hewl û şîyan kirine di wî warî de, derhêner 'Hisên Sêwdîn' filîmek kêşand, ku bingehê senaryoya xwe li ser beşek li romana 'Şehrê Mûzîkjenên Spî' a nûser û romannûsê mezin 'Bextiyar Elî' çêkir, ew jî nebûna pisporiyetê û teknîka pêdivî neşîya serkeftin bi destbixe.

(Azad Kerkukî, Peywendî Nêwan Sînema û Edeb Peywendyekî Hemîşe Zîndû, Govarî film, Weş. Rêveberya Sînemaya Silêmanî, Temûz 2010, Jmare 4, R:27; <http://chawigal.com/archive/chaw.php?name=News&file=article&sid=361#.XE2cztszBIU>, Dana Mehmed Abullah, D.G, 2/3/2016)

Ji aliyek dî derhêner 'Hesen Elî' çîrokeka nivîskar ê gewre 'Şêzad Hesen' wergit bi navê 'Gerekî Deholekan' ev çîrok ji çîrokeka kurt a vî nivîskarî bû, lê derhêner bi alikariya nivîkar şîya çîrokê berfireh bike û bi hev re bikin sînyoyeke mezin ku bişên biki filmeke dirê jî.

Gelek kurtefilm jî hebûne bes van kurtefilman neşîyane dengê mezin bidin. Hemû filmên ku bûn film û ji edebiyata Kurdî sût wergirtin bêguman pîroz in herçiqas deng nedabin jî ango ev heldan bûn rêç bo çêkirina filmên baş.

2.2.2 Filmên Kurdî Ji Edebiyatê Kurdî Sût Wergirtine? (Hevpeyvîn Li Gel Piştîwan Adullah)

Heke em berê xwe bidin sînemaya cîhanî sînyoyên xwe ji edebiyat yan jî ji deqeke edebî wergirtine ango deqeke edebî guhertine kirine sînyoye. Fîlma yekem a ku li Başûrê Kurdistan hatiye çê kirin sînyoye wê ji edebiyatê hatiye we ê bibînin ku gelek ji wan filmên bi binavûdeng ew film in ku sînyoye xwe ji deqeke edebî wergirtine ku ew roman, çîrok, destan û hwd in. yan jî nûsîna kitêbeke nûserê cîhanî ne. Ji ber wê yekê em berê xwe bidin filmeke cîhanî a binavûdeng ku ji edebiyatê hatibe werirtin em dibînin ku diyalog gelek xurtin û tîjî peyvên mezin û can in. Em hêst dikin ku guftugoyeke edebî di nav wan filman de heye. Beravajî vê yekê em dibînin ku di nav sînemaya Kurdî de aliyên edebî gelek qels in. Ji ber ku piştî xwe daye folklore, Bîrên sade, rûdawên dîrokî û rûdawên sîyasî. Bi wateyêke din sînemaya Kurdî piştî xwe nedaye edebiyateke mezin ji ber vê yekê di sînemaya Kurdî de gutugoya edebî yan jî diyalogên mezin di navbera lehengan an jî lîstikvanan de tune. Ger hebe jî gelek qels maye. Yek ji aliyek kêmasiyên sînemaya kurdî ew e ku derhêner an jî sînemakarên Kurd nîkaribûne deqên edebiyata Kurdî bikin malê sînemayê. Her çiqas edebiyata kurdî ji hêla çîrok, roman an jî hemî deqên edebî yên dî dewlemend bûbe jî nikari bûye ji vê dewlemendiya xwe sût werbigre.

Yek ji kêmasiyên sînemaya kurdî ew e ku sînyonîvîsên baş tune bûne. Yan jî kesek tune bûye ku tenê serê xwe bi nûsîna sînyoyan biêşîne û karibe deqeke edebîya baş li sînemayê zêde bike. Her wiha em dikarin bibêjin ku sînyoya cêbcêkar cudaye ji sînyoya niviskî. Hinek nûserên mezin hene li Kurdistan dema tu berhema wan dixwîni di tê de filmekî an jî sînemayekî dibîni wek yê ‘Merîwan Wirya Qanih, Şêzad Hesên, Bextiyar Elî, Hisên Arif û hwd.’ Dema em berê xwe didin berhême van gewreyan em dibînin ku berhêmen xwe bi şêwazeke sînemayî nûsîne.

2.2.2.1. Gelo Piştî Van Gotinên Ku Me Kir Em Dişên Bibêjin Li Kurdistan Sînyonîvîsên Me Hene?

Na: Em nikarin bibêjin sînyonîvîsên zanistî hene. Dema kêfa derhênerê/ê ji deqeke edebî re were, wê deqa edebî bi fikir û ramanên xwe dihûne û ji xwe re bi vî awayî wêneyan derdixîne û dike sînyo. Ji ber vê yekê gelek caran filmên wan pûç û vala dertên. Ji ber wê sînyoyeke temam berdes nîne ku filmeke sînemayîyeke can jê derkeve.

Em têdigihêj in ku Kurd xwedî edebiyateke mezin in lê belê heta niha sînyonîvîsekî baş an jî derhênerê baş tune ye bi wan deqên edebiyata Kurdî yê mezin tiştê baş derxine holê. Derhênerên me yê Kurdan zêdetir piştî xwe didine van tiştên ku me behs kir. Ji ber wê yekê em berê xwe bidin mijarên filmên kurdî gelek ji wan filman behsa rûdaneke dîrokî yan jî serpêhatiyên ku di ser Kurdan de hatine kirine mînak: Enfal, Helebçe, Raperîn û hwd. Her wiha hewla derhêneran ne ew bûye ku behsa çîrokeke însanî bikin di çîroka xwe de mijar her çî be ew dane ev jî bûye kêmasiyek ji bo derhênerên Kurd.

2.2.2.2. Kêmasiyên Ku Di Sînemayê De Heyî Yê Derhêner e Yan Yê Nîvîskaran in?

Nûserên me hem kêma in hem jî kêmasiyên wan hene. Bes hinek ji wan bi şêwazeke baş dinivîsin di vî warê da. Kêmasiya herî mezin dibe ya derhêneran ji ber ku derhênerên Kurd, ji bo çêkirina filmekî gelekî lez dikin. Duyem arîşe ew e ku eleqeya derhêneran, bi edebiyata Kurdî re tune ye çimkî derhêner me di bin bandor a filmên bîyanî de dimînin.

2.2.2.3. Gelo Lehengên Di filmên Kurdî De Çawanin?

Di sînemaya Kurdî de leheng hemî yek in. Ger em berê xwe bidine 100 filmên Kurdî em ê bibînin ku hemî lehengên wan filman westiyayî ne, serîraker in di jiyana xwe de. Yek ji xalê herî girîng ya leheng ew e ku girêdayê sirûştî ku bixwe tê de dijî ye. Ew sirûştî Kurdistan e. Lehengên kurdî lehengên westiya yî ne û xwedî armancekî ne ev armanc jî armanceke wisa ye ku leheng nikare xwe bigihîne ango utopîk e. Ji ber vê yekê lehengên filmên Kurdî nagêhêjin armanca xwe. Filma Yılmaz Guneyî ya bi nave ‘‘Rê’’ mînak e ji bo vê yekê. Lehengê filma rê yekem lehengê filmeke Kurdî ye. Di dawiya filmê de leheng ji hemî peywendiyên civakî dûr dikeve û hevjiîna wî dimire ku gelek tişt ji destên wî diçe. Leheng li wî gundê ku lê dijîya namîne her wiha wekî me li jor jî gotibû ku leheng naweste û her rêya xwe berdewam dike. Di vê filmê de leheng her di rêyekî de ye ku rê sirûştî ciwaniya çiya û

dar û ber ên sirûştî Kurdistanê pêktê. Belam derhêner di dawiya filmê de bi me dide zanîn ku leheng di rêyeke dûr û nediyar de dimeşe. Leheng him yek ji neferê axa xwe ye him jî serîrakerekî vê axê ye.

Gelek lehengên filmên kurdî pêkhatiya rasteqineya jiyana kurdî ne û dûr in ji lehengên xeyalî (Batman, Superman). Heke em berê xwe bidine filmên Behman Gubadî lehengên ku di destpêkê de di filmên xwe de dida lîstin lehengên zarok in. Lê dîsa jî leheng westiya yê ne û di jiyaneke dijwar de dijîn. Leheng her tim hewl dide ku xwe ji jiyana xwe ya dijwar rizgar bike. Bi nêrîna min derhênerê kurd bi şeweyekî kar kirine û piştî xwe nedane edebiyata Kurdî. Gelek derhêneran hewl dane ku jiyana civakê çî hebûbe wan bidine nîşandan. Ji ber hindê hemî rûdan wekî xwe dane. Dema ku em filmeke Kurdî dibînin mirov dizane ku derhêner behsa wan rûdanên ku ser wî de hatine û bixwe jî raçev kiriye dide nîşan.

2.2.2.4. Mirov Çawan Dizane ku Filmek Bi Eslê Xwe Kurdî Ye?

Ji bo em bizanin ku filmek çawa dibe filmek Kurdî? Pêdiviya me ji xalên jêrê hene ku ev xalên jêrê bi me didin zanîn ku filmek eslê xwe Kurdî ye yan ne Kurdî ye.

1- Fikr ango Çîroka filmê Kurdî be.

2-Lîstikvan, Teknîk û Teknîkarên wê Kurdî bin

3- Zimanê Filmê Kurdî be

4- Cihê çêkirina filmê divê Erdnigariya Kurdistan be.

5-Tiştî herî girîng ew e ku budçeya filmê ji budçeya Kurdî be. Li gor standarta cîhanê film her li ku çê bûbe dibe male wê deverê.

6-Divê film xwedî bazar û bîneran be

Ev tiştên ku me li jor Behs kir wek standart bo hemû neteweyên cîhanê. Belam hinek ji wan xalên ku me li jor behs kirine nebin jî di nav filmê de dîsa ew film dibe filmeke Kurdî. Bes gelek ji wan xalên ku me li jor behs kirine jê kêm bin ew film nabe filmeke kurdî. Mînak: Filma ‘‘Ardan Kral’’ çîrokeke kurdî ye. Bes erdnigariya wê ne Kurdistan e, Derhêner, Lîstikvan, çê kirin û zimanê wê jî ne bi Kurdî ye. Ji ber wê em nikarin bibêjin ku ev filmeke Kurdî ye çîrok bixwe çiqas kurdî be jî. Lê belê em berê xwe bidin filma Mehdî Umêd yan jî Huner Selîm em dibînin ku derhêner Kurdî ne Çê kirin. Teknîk û teknîkar û zimanê wê jî bi Kurdî ye. Bi van yekan jî dikevîne di nava çarçoveya filmên kurdî. (Hevpeyvîn: Piştîwan Abdullah)

2.2.3. Peywendîya Sînemaya kurdî Li Gel Çeşnên Edeba Kurdî

Filmên sînemayî li cîhanê bi janra dîkomentêrî dest pê kiriye. Piştî vê di demeke kurt de sînemayê ji deqên edebê wekî şano, çîrok, roman û hwd. Wergirt. Deqên edebî wexta ku bo sînemayê hate bikar anîn bes dest pêkê de filmên ku hatin çêkirin ji hêla teknîk û hunandinê ve qels bûn ji ber vê yekê jî romanek bi giştî nebû para filmekî. Lê piştî hatina teknolojiyê her tiştek zêdetir pêşket ku vê jî rê vekir bo deqên edebê ku bibin film.

Eger em berê xwe bidin Kurdistanê ji hêla wergritina mifayê ji beşên edebî, kêma û zêde mifa ji beşên edebî hatiye wergirtin. Lê mixabin ev wergirtin têra edebiyata Kurdî nake, li gor wê dewlemendiya di edeba Kurdî de. Edeba Kurdî pirr in ji hêla çîrokên û serhatiyên hêja ve, ku ji wan gelek berhêman baş li dû xwe hiştine, lê mixabin derhênerên Kurdan nikaribûne ji wan deqan filmke baş çê bikin.

2.2.3.1. Roman

Roman ew çeşna wêjeyê ye ku ji çeşnên dî yên edebî ên pêş xwe mîna efsane, destan, hikayet hwd. Peywendîya wê zêdetir bi rastiya jîyanê re heye. Ji ber ku roman bi şeweya pexşanî tê nivîsîn qada xwe ya nivîsê berfirehtir dike, ji qaydeyên helbestê azade ku ev jî rêya romanê vedike bi vî şiklî roman dikare li ser kêşe û armancên mirovahiyê rêya çareseriyê nîşan bide. Sereteya damezrandina romanê bûye pireyeke rasteqîn di navbera edeb û rastiye da. Romanên sedsala 18 û 19yê digel hemî sedsalên dî jî da xuya kirin ku roman hunereke rastiye ye û bi awayekî xurt behsa jiyana mirovan dike an jî bi nivîskî behsa jiyana mirovan e. Romanê ‘‘Daniel Dîvo, Samûl Rîçardson, Henry Fîldînk, Balzak, Dostoyevskî, Maksîm Gorkî û bi sedan romannûsên niha belgene ku roman edeba jîyanê ye. (Necim Elwanî, Tioriy Komelnasî Roman, Weş. Zankoya Sileheddîn, 2017 Hewlêr, r. 19)

Herwiha Ebdula Saraç di pirtûka xwe ya ‘‘Beraw Astaney Roman û Goşenîgakan’’ de di derbarê pênaseye romanê de dibêje: Roman wek cureyek edebî sistemeke çêkiriye, hertim vekiriyê şîrovekirinê ye. Mirov dikare bişîbîne deryayekî. Her çend tu bi kûrayî li ser hûr bibî zêdetir xurtir dibe. (Ebdula Saraç, Beraw Astaney Roman û Goşenîgakan, Weş. Dezgehî Çapî Serdem, Hewlêr 2007, R:9; Ebdula Rehman, Binyatî Gîranawa, r. 15)

Roman bûye amûreyek ji bo gîhandina hûnerên dî: Wek sînema, şano, montaj û hwd. Hemî jî ji xwe re kiriye keresteyek û wan di nav xwe de hewandiye. Di wê serdemê de milletên dî bi romanê tene naskirin, wateya romanê bûye nasnemeya derbirîna jîyan û şaristaniya milletan. Eger em berê xwe bidine xelatên nobelê ên çûyî di warê edebê de ku her sal didine nûser û şa’iran listeya berdestê me dide xuya kirin ku di navbera salên 1991-1993an de 87 heft xelat hatine dayîn 42 ji bo romanê hatine dayîn beramberê vê yekê 24 xelataên dî bo şa’iran hatiye dayîn. Ev yek jî bi me dide xuya kirin ku Roman di wê serdemê

de xwedî giringiyeke giranbuha bûne. (Baknîrb.Tedavîl, Mêjûy Edebiyatî Cîhanî, Werger: Heme Kerîm Arif, Çapa yekem, Çapxaneyaya Rojhilat, 2008 Hewlêr, r. 391-395)

Romana Kurdî ji sal ên 1930î pê de di wêjeya Kurdî de bi rêya nivîskarên Kurd ên li Sovyetê derket holê. Piştî şerê yekemîn ê cîhanê sala 1920î ji ber zordestî û penaberiyê li gel xebatên ziman û çanda Kurdî roman hatin nivîsîn ku yekem romana Kurdî ya Erebê Şemo bû pişt re Şivanê Kurmanca her wiha romanên Eliyê Evdîrehman û Heciyê Cindî ji mînakên girîng in bo vê yekê. Ji salên 1970î pê de jî roman yek û yek êdî li her parçeyên Kurdan hatine nivîsîn. (Nezîr Ocak, Edebiyata Kurdî, r. 293)

Wekî janreka edebî ji sînemayê gelek mifa lê hatiye wergirtin, di sînemaya cîhanî de gelek romanên nivîskarên mezin hatine hate guhartin bo sînemayê, van guhartinan wisa kir ku gelek filmên baş hatin çêkirin. Li Kurdistana Başûr jî bi heman şiklî gelek berhem bûne malzeme bo sînemayê.

Yek ji wan filman ku li Başûrê Kurdistan bi vî awayî bû sînyaro ku bingeha xwe ji romana ‘Janî Gel’ girtibû. Ev film a ji aliyê derhêner ‘‘ Cemîl rostemî ‘‘ hat çêkirin ku ji romana ‘Îbrahîm Ehmed’ hatibû wergirtin. Ku çîroka vê berhemê trajediye û behsa xebat û têkoşînên li Başûrê Kurdistan pêkhatiye dike.

Bi kurtasî çîroka vê filmê, kurikeke ku navê wî ‘‘ Ciwamêr’’e. Ciwamêr digel hevjinê xwe dijî, navê hevjinê wî ‘‘ Kalê’’ye , kalê jineke pêgiran e, dema ew êş a ku zarokê tîne lê giran dibe ‘Ciwamêr’ dixwaze here li cem ebekê (maman) bo Kalê bîne, lê rûdanek derdikeve li hemberî wî, ew jî xwenîşandanên Kurdên Başûr e li hember rejîm a wê demê ku daxwaza aşî û birayetî dikin di navbera Kurd û Ereban. Ciwamêr dikeve nav a xwenîşanderan, ji aliyê rejîma wê demê tê desteserkirin bi tometberiya hebûna peywendiya wî ya di navbera xwenîşandaran ve. Wê demê ‘Kalê’ jî bi êşa xwe dimire. Ciwamêr dema ku derdikeve, dibîne ku ne malê wî ne jî hevjinê wî maye û neçar maye vedigere gund.

Derhêner ‘Cemîl Rostemî’ bi rêka vê yekê hewl daye ji çarçoveya çîroka romanê dûrnekeve di nav sînorên romanê de fil çêkiriye. Ev film ji hêla ‘Solo Film’ê ve hatiye çêkirin ku çêkirina wê salekî dewam kiriye ku film ‘100’ deqeye, teknîkar û listikvanê filmê Kurdin her wiha film li erdnîgariya Kurdistanê hatiye çêkirin. Em dikarin bêjin ku filma ‘Janî Gel’ yek ji baştirîn filman e li Kurdistana Başûr ku bingeha xwe ji deqeke edebî wergirtî ye. Ev filma ji gelek fîstîvalên cîhanê hatiye pêşandan û çend xelatên navnetewewî bidest xistiye

2.2.3.2. Çîrok

Ji wê cureyê wêjeyê ye pexşanî yan jî digel yê pexşanî bi stranî ku bûyereke rastî an jî nîgaşî, bi şêweyê kurt, ji aliyê çîrokbêjan ve tê vegotin. Hin çîrok di nav demê de şêweyê destanê digirin weke destanê tîn vegotin. Mijarên çîrokê, pircihê ne. Dibe ku mijara wê leheng û kesayetiyan dîrokî be, dibe ku evîna evîndaran be dibe ku ku serpêhatiyên kesayetiyan di nava gel da nûmûnedar be. Vegotina çîrokên kurdî ji aliyê kesayetiyan zanabêj ve bi awayekî kelecânî, bi alikariya liv û lebatên mîmikên çav û birûyan, dest û tilîyan, serî û bedena çîrokbêjan ve tîn çêjandin û zengîn kirin. (Nezîr Ocek, Edebyata Kurdî, r. 291)

Bêjeya “Çîrokê” di sala 1893an de di gel ferhengeke Kurdî-Erebî de hatiye bikaranîm. Navê Ferhengê El-Hemidiyye Ft’î Lugat El-Kurdiyye ye û ji aliyê Yusuf Ziya Paşa El Xalidî El-Miqdisî ve hatiye nivîsîn û li Stenbolê hatiye çap kirin. (Haşim Ahmed Zade, *Ulus ve Roman*, Wer. Azad Zana Gundogan, Weş. Perî, 2004 Stenbol, r.190)

Ji aliyê berhevkarî tomarkirina xebata herî berfireh di salên 1850î de ji aliyê Mehmûdê Bazîdî 1797-1867 hatiye kirin. Wî di gelek beşên folklorê Kurdî de berhem dane. Du pirtûkên wî yên bi navê Adaet û Rûsumatnameya Ekradiyyê û Camieyan û Hikayetên bi zimanê Kurmancî berhemên giranbûha ne. Ji bilî vê, wî çîroka “Mem û Zînê” wekî pexşanekî nivîsandiye. Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Weş. Avesta, Stenbol 2015, r.249.

Di dest pêka sedsala 20an de di warê çîroka kurdî de hîn kesên din jî derdikevine pêşberî me. Yek ji wan Qedîrcan e yê din jî Nuredîn Zaza ye. Ev nivîskarana bi tenê çîrok nenivîsîne herwiha helbest, gotarên sîyasî û hwd. Ji nivîsandine. Ji bilî van kesan em dikarin bibêjin ku di warê çîrokê de nîv sedsala 20an de kesên wekî Mehmed Emîn Bozarslan, Zeynelabîdîn Zinar, Çiya Mazî, Hesên Kaya, Rojbîn Ozkan hwd. Hene. (Nezîr Ocek, *Edabyata Kudî*, r.292)

Di nava kurdan janira çîrokê cihekî mezin girtiye çî çîroka ku hatibe nivîsîn be yan jî çîroka folklorîk be. Gelek nivîskarên Kurdan hene ku di karê nivîsîn a çîrokan de serkeftî ne bes ji hêla sînyarî nivîsîn ê de qels in. Digel van kêmasiyên ku di sînemaya Kurdî hene jî derhênerên Kurdistanê karibûne bi wergirtina van çîrokan ve filmên baş çê bikin.

Bo mînak filma “Grekî Deholekan” ya derhêner “Hesên Elî” ku bîngeha sînyarîyoya xwe ji çîroka nivîskar “Şêzad Hesên” wergirtiye. Jixwe ev çîrok çîrokeka kurtbû, derhêner bi alikariya vî nivîskarî ev çîrok berfirehtir kiriye ku jê filmeke serkeftî biafirîn in.

Çîroka vê filmê ji zilm û zordariya axayekî pêk tê ku li Kurdistanê ew axa kesekî bi zilma xwe hatiye nasîn bûye bes ji hêleke din her çiqas axa kesekî wiha bûbe jî bi wijdana xwe re rûbirû maye ku vê yekê jî nehiştiye axa azad bijî li dijî wijdana xwe. Dawîyê de axa dîn dibe.

Derhêner "Hesen Elî" li gel derhêner di çêkirina vê filmê de cih girtiye ku vê yekê jî rê vekirîye ku çîrok bibe film. Ev filme jî li erdnîgariya Kurdistana Başûr hatiye berhevkirin û teknîkar û listikvanê vê filmê jî Kurd in. Film ji gelek fistîvalên cihanê xelat wergirtiye.

2.2.3.3. Şano(Tiyatro)

Tiyatro peyveke yewnani ye, di wateya dîtina "Cih" de tê bikaranîn. Tiyatro ji bêjeya "Tea'yê" hatiye sazîkirin ku ew jî tê wateya qadê. Di cihê bêjeya tiyatroyê de "Dram" an jî "Dramatîk" tê bikaranîn. Taybetîya herî girîng a ku şanoyê ji çêşnên wêjeyê yên cuda dike, ew e ku Şano li ber girseyeke bi şêwazeke libatî tê nîşandan. Lewre şano bûyerekê temsîl dike: Temsîlî jî mercê berhema şanoyê ye. Ya sereke û bingehîn e. Nirxê berhemekî leyistandina leyizê zanin. Hunera şanoyê bi grûbî tê listin grûb jî di listikê de yan serdikeve yan jî têk diçe. Berhemeke şanoyî ji nivîskar, berhem, listikvanan pêk tê. Pîrî caran nivîskar, kesekî/ê xuya ye. Hîn caran jî dibe ku kesekî/ê ne xuya yan jî komek be.

Terma "Şanoyê" di nivîsa Kurdî de, ji aliyê helbestkar û nûserên klasîk yên Kurdî ve, her wiha di ferhengeke "Kurdî/Biyani" yan "Biyani/Kurdî" ya sedsalên bihurî de hatiye. Cara ewil, "Mehwî" 1836-1906an de dawîya sedsala 19em de terma "Tiyatro" ya latînî (Theatre) bi vê şêweyê kar aniye:

"Dinya tiyatroya Meweste tiya ye, biro

Kê maweye ke nebûbe tiyatro"

Ji dest pêka sedsala 20an û bi vir de ji bo hunera şanoyê, hêdî hêdî di nav rojname, kovar û di belgeyê çapkirî de termên şanoyên Ewropayî yên wek "piyes, tiyatir, dram" hin caran jî terma Farisî û Erebi yên mîna "Nimayş û Temsîl" tên dîtin.

Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî, yekem nûserê şanoya Kurdî tê qebûl kirin ku wî sala 1919an de, di kovara Jîn, hejmara 15-16an de, li stenbolê navek bo hunera şanoyê(theatre) peyda kirîye. Hekkarî du term bikar anîne: Piyas û Tiyatir. Wekî ku em dibînin wî jî dîsan terma latînî bikar aniye.

Helbestkarê nûxwaz, Ebdula Goran, dibe ku yekem nûserê Kurdî be ku di sala 1950an de terma şanoyê bikar anî be. Ev yek jî di helbesta "Cilweyî Şano" ya di dîwana "Firmêsk û Huner"ê de, ku di sala 1950an de li Bexdayê, li çapxaneyê Mearîf de hatiye çapkirin. Diyar e piştî vê bikaranînê terma şanoyê ketiye nav nûseran û hatiye pesendkirin. Di

dawiya sala 1957an de di Rojnameya Jînê (Hejmar:1337) de, goşeyek bi navê “ Sînema û Şano” ji aliyê Nûrfî Weştî ve tê vekirin. Di rexneyeke şanoya 1960î de, ku di derheqê şanogeriya “Çîrokî Şorişî Helwasrawekan” de ye, li nik terma kevn “Mîrmîrên” a çêkirî ya Gîwî Mûkîryanî (1903-1907) bi kar hatiye. Terma şanoyê di sê derên gotarê de derbas dibe. (Çetoyê Zêdo Yavuz Akkuzu, Dîroka Şanoya Kurdî, Çap Yekem, Weş: Peywend, Stenbol 2015, r. 17-23)

Şano yeke li mijrê edebî ku direng hatiye nav Kurdan de, di demekê zêde şano bo Kurdan wek karêkî baş ne dihat dîtin. Ji ber wê yekê şano li Kurdistanê direg ma. Di wan salên berî da şano di nava kurdan qedir girt, bitaîbet li Kudistana Başur, gelek şanokarên mezin derketne qada şanoyê û bu sedema wê ku rêveberiyaka giştî bi navê şanoyê bête avakirî li hêla hukumeta Herêma Kurdistanê bo rêvebirna karên şanoyî. Ev rêve beriyê karên şanokaran û şanoyê bi rêve dibat, kariya gelek festival bo şanoyê li dar bixet heya nuha berdewame li piştgirya şanokarên hemu Kurdistanê, her sal fistîvala şanoyê li dar dixet

Derbarê vê ku deqa şanoya kurdi hatiye wergirtin ji hêla sînemaya Kurdî de. Em dikarin bêjin ku heya niha deqên şanoyê nehatiye wergirtin bo sînemayê tinê di sala 1974an da filmek hat çêkirin bi navê “ Berew Xor” bi derhêneriya “ Newzad Mecîd “ ku bingeha sînyarîya xwe li ser şanonamekê şanokarê mezin ya Kurdistanê Başur “ Ehmed Salar “ wergirtibû. Ev filma wêne girtina wê bi dawî hat. Lê mixabin di dema montajkirina wê li welatê Îranê hat ji nav birin, em dikarin bêjin ku ev film yekemîn filma Kurdistanê Başur bû û bi teknîkarên Kurdî hatibû çêkirin.

2.2.3.4. Dastan

Destan, yan jî “Pûyem” an jî “Îpos” xwedî çiyekî girîng e di edebiyata cihanê de. Destan, di edebiyata folklorê gelan de û edebiyata niviskî de ji aliyên dîmen, rûxsar(xuyanî) û naverokê ve tevlihev e. Ev rastiya jî di edebiyata folklorê Kurdistanê û niviskî de wek gelên dî ye. (Izedîn Mistefa Resûl, Lêkolînewey edebî folklorî Kurdî, R:31)

Destan an jî “Efsûn”, zêdetir jo bo mêrxasiya palewanan têtê bikaranîn. Peyva destan ji eslê xwe ji “Dawastan” hatiye ew jî tê wateyê cihê şer an jî cengê. Ango destan ji “Dadistan” tê ku bi wateya xwe cihê dadgehê ye. Bi demê re ev peyv guherî bû destan de. (Eledîn Sucadî, R:120)

Destana Kurdî de dîmen û rûxsarîkêşî wek wan destananin ku di folklorê edeba gelên dî de heye. Belam rêya jiyane ya civakî û rêbaza taybetî ya pêşveçûyîna edeba xwe (folklor û nivîs) hindêk dabeşkirinê cuda di nav dîmen û destanên Kurdî de çêkiriye bi taybetmendîya edebîya xwe (Kurdî). Li gor encamê em dikarin destana Kurdî bikine du beş: (Izedîn Mistefa Resûl, Mêjûy Edebî Kurdî, r.40)

1/Destana Qehremaniyê

Di vê destanê egîd bi xwe mêrxas in. Ev destanana wekî efsaneyanin. Dîmen û wêneyên van destana zêdetir xeyalî ne ku ev wêne û dîmen jî qala mêrxasan dikin. Em dikarin bêjin zêdetir dişibine çîrokên şehnameya Fîrdewsî, di civînên destanên qehremaniyida û civînên edeba faris bûne navûdeng. (Ubeydûlay Ebû Bîsyan, Çirîkey Mem û Zîn, Kurdî-Farisî, bê çap, Tebrîz 1959 r.10)

Destana qehremaniya Kurdî tenê behsa mêrxasî û egîdiyan dike. Gelek caran destan hatine çêkirin belam tiştên dervehişiyê û tiştên ku tiwanaya(bişiyana) mirovan de tunebe wekî destana şahnameyan tê de nîne. Gelek caran kesên rasteqîn e, azayetî di vê cureya destanê de pêkvehatine girêdan. Ango her kesek di jiyanê de egidiyek kiribe, navûdeng bûbe û azayetiyek kiribe ku ev azayetî di nav Kurdan de bûye destan herwiha ji bo xelkê jî hatiye gotin. Em dikarin navê hezar destanê bi vî rengî binivîsin: Bişarê Çeto, Beytî Şerîf Hemawend, Emêyê Gozê, Ezîz û Tekiş û Hwd. (Îzedîn Mîstefa Resûl, Mêjûy Edebî Kurdî, r. 41)

Destana qehremaniya kurdî keresteyeke (Amûreyeke) dewlemend e ji bo lê hûr bûn a gelek rûyên jiyanê yên niha û rabirdûya kurdan. Di wan destanan de zor rewîşt û sirûştên Kurdan dibînin, ev destanana mînakin ji bo çîgirkirina dîrok û textê rabirdûya Kurdan. (Mihemed Tewfîq Werdî, Folklorî Kurdî, Berga yekemîn, 1968 Bexda, r. 19)

Kurd ji hêla destanên gelek dewlemend in, gelek dastanê mezin di nava Kurdan de hene. Lê ew jî weka curên di gelek nehatîne bikar anîn ji bo filman.

Filmeka ku bingeha xwe ji çîroka folklorê kurdî wergirtiye filma “ Xurşîdê Çav Bi Xal”e bi çêkieina derhêner “ Viyan Maiy” ye. Ev film behsa dastaneka Kurdî diket ku di navbera Mîrê Êzîdîyan, axayekî Kurdan li Bakurê Kurdistan Mîrekî Eceman de rûdaye.

Çîroka wê bi kurtasî. Xelîl Axa mîrekî Kurd e, dixwazît keça xwe “Sermîxan”ê bide mîrê Eceman bo parastina desthilata xwe, lê keça wî aşîqê “ Xurşîdê Çav Bi Xal”e û razî nabe pê re bizewice. “Sermîxan a ku naxaze bi kurê mîrê Eceman re bizewice, diçe li cem mîrê Êzîdîyan ku ew bixwe li “Baedir” in. Mîrê Eceman ji ber vê yekê êrişê mîrê Êzîdîyan dike û şer navbera wan de derdikeve.

Ev filma bi rêka wergirtina azad hatiye çêkirin, derhêner jî ev çîrok wergirtiye û kiriye sînyaro û pişt re jî kiriye film. (Berevan Ehmed, Çîroka Foliklorê Xurşîdê Çav Bi Xal Li Sînemayê de, Kovara Film, Weş. Rêveberiya Sînemaya Silêmanî, Silêmanî Temûz 2010, Jimare 4, r.3)

2/Destana Dildarî û Evîniyê

Ev destan ji hêla “ÎPÎOS” ve tê danîn çimkî di nav Kurdan de ne tenê rûdaneke evînî û dildariyê ye ku li rexê wî keresteya(amûreya) destana qehremaniyê tê da têtê dîtin. Destana Dildariyê li hemî derên cîhanê bi taybet li rojhilat soz û hesteke kûr a rastgoyiye ku xwedî rûdaneke huneriye. Ew jî dikeve xezîneya edeba lîrikî. Destana dildariyê li rex soz, hest, xoşewîstî, rastgoyî, cureyekî ji azayetiye derdixe. Ev taybetmendiya wê wisa dide xuya kirin ku xwe nêzîkê rastiya rûdanên berê dike. Rûdanên kesayetiye rastî yê dîrokî ên ku dibine mijara destanekî gelek caran dişibine Destanên Dîrokî de. Ew destanana wekî hemî destanên dildarî yê cîhanî bi taybetî yê Rojhilat rewşa civakî bi me didine xuya kirin. Destanên Kurdî herçiqas xweser be jî digel destanên cîhanî têkilker e, ku meriv dikare çîrokên folklorê me, stran û gotinên pêşyan bi vî awayî pênas bike. Di zimanê Kurdî û Farisî de destanên bi vî rengî hene ku nav û naverokên wan wek hevin: Leyl û Mecnûn, Şîrîn û Xesrew û hwd. (Manzûme-î Kurdî ‘Mîhr û Wafa’ Metin Kurdî tercim Farisî, Zabit û Terceme Tewz’î Ez Qadir Fetahî Qazî, Tebrîz, 1948, r.4-5)

Li hêla dastana avînyê li Kurdistana Başur deqek hatîye wergirtin aw jî çîroka (keçî Kafroş)e, ji alyê derhêr “ Tenya Kerîm ” hatya çêkirin. Çîroka wê dastanê behsa kiçeka Kurde ku efserekê birîtanî Dikete evînî da. Ev keç, keça kafroşekêye li Kurdistana Başur. Eferê birîtanî çend car daxaza wê keçe diket lêbelê keç naxaze gel wê bizewce, û bavê keçê ji di bêje ez keça xwe nadem dujminan. Efsere bê hîvî dibe û biryar didet ku keçê bi revînê, di rojekê da keçê di rezînê u di bebt welatê xwe. Di çîrokêda wesa hatya ku keç ji alyê kesekê têt kuştin li welatê xerbi de. Derhêner “Tenya Kerîm ” xebat kirya ji rêka wergirtina azad wê çîrokê bo me vegozeze.

2.2.3.5. Efsane

Efsane ango mîtolojî di xwe de wateya mezinkirina xwedê/yan di hewîne. Zanist jê re dibêjin Mîtolojî. Di sedesedsala wan de beriya mîladê derbarê efsenayan de baweriyek hebûye bi navê baweriya Bohîmîrî ku feylesofê Yûnanî “Bohîmîryos” afirandiye. Ew dibêje: “Efsane tenê ne tişteke xeyaliye, keresateke dîrokî yan jî rûdaweke, ew xwedayên di efsanayan de ku behsa wan hatine kirin yan jî ew qehremanên di efsanayan de derbas bûne piştî ku zemanek li ser wan re derbasbû ew padîşah û palewan wekî xwedayekî hatine dîtin. (Eladîn Sûcadî, Mêjûy Edebî Kurdî, r. 121-122)

Efsaneyên Kurdî di nav neteweya Kurdan de efsane xwedî hêjaneke mezin û gelek pêşketî bûne. Her wiha xwedî cihekî taybet bûye. Heta niha jî di nav Kurdan de dev bi dev efsanayan vedibêjin. Di nav gelê Kurd de, efsane xwedê paye û pileyeke berz in. Efsane wêneyekî balanima û ronî ne ji bo fêrbûna awayê jiyana Kurdan. Efsane rojgarên pir kevn in û bûyer û karesatên (Serdahatiyên Nexweş) şikeftan û jiayan Kurdan a wê serdemê ji me re

dibêje. (Nezîr Ocek, Edebyata Kurdî, r.: 1301; Feqî Huseyn Sağniç, Dîroka Wêjeya Kurdî, R:39, Sidîq Borekey, Mêjûy Wêjey Kurdî, r. 35)

Li gel wan hemû efsana ku di nava Kurdan da hene lê heta niha sînemakarên Kurd ne karîne sûd li deqên efsana Kurdî bibînin.

2.2.3.6. Helbest (Şi'ir)

Di Kurdî ji Şi'irê re, Helbest, Honrawa an jî Hozan tê gotin. Îngîlîzî jî wekî "poetry" tê pênase kirin. Helbest dezgahek e ku xeyalên mirovan bi awayekî nazik dide der û însanan ber bi xwe ve kaş dike. Helbestvan û helbestên Kurdî gelek in lê mixabin lêkolînên zanistî yên berdest pirr kêr in anku di wan herêmên ku Kurd lê jiyane kevnartirîn helbest, helbestên kurdan in. Ronî û eşkereye, ku berî Îslamê helbest bi zimanê Kurdî hatine hunandin. Helbesta Kurdî serê xwe di gelek dergehên de rakirîye û gelek şûn û war dîtiye. Beşa Avestayê ya bi navê 'Gata' yan 'Gatan' hemû bi awayê helbest û kîteyî nivisîn. Niha jî ew awayê helbestgotinê di nav Kurdan de heye. Di Avestayê de bi taybetî helbesta dehkîteyî tê dîtin. Helbestkarên Kurd jî piraniya helbestên xwe li ser kîteyan nivisîne. Li gorî wan belgeyên ku di destên me de ne, derdikeve holê ku beriya îslamê di nav gelê Kurd de gelek helbestkar derketin ku wan bi Kurdî helbest ristin e.

Li ser gotina Mamoste Dr. Seîd Xanî Kurdistanî nêzikî sed sal berê, li ser parçe çermik li Şikefta Cêşane ya Silêmaniyê hatiye dîtin ku çend helbest bi zareveya Goranî li ser hatine nivisîn. Di wê serdemê de misilmanan Şarezûr û gundên derdorê dagir kirine, ew helbest jî rengê wê serdemê vedibêje. Ev helbest ku nêzikî 1400 sal berê hatine gotin. Ev yek nîşan dide ku helbest di nav Kurdan de berî Îslamê jî wekî niha li pêş bûye. (Feqî Huseyin Sağniç, Dîroka Wêjeya Kurdî, r.43-44; Sedîq Borekey, Mêjûya Edebîya Kurdî, R:37-3; Aladîn Sicadî, Mêjûya Edebîya Kurdî, r.165-168)

De qada helbestê de dekarîna bibêjîna heta niha li Kurdistana Başur çî helbestên helbesvana nehatye wergirtin ji bo sînemayê, Tinê çend kurt Film hatye çêkirin ku bingeha sînyarê xwe li helbest wergirtine. Yek li wen filma ku bingehê xwe li helbestê wergiritye filmê (Geme) li derhênana (Mohammed Abullah) ye ku bingeha wê fimê li helbasta helbestkarê mezina Kurdistana Başur (Hêmin) wergiritye.

2.2.2.7. Gotinên Pêşyan

Di Kurdî de jî Gotinên Pêşyan re, Gotinên Mezinan, Peyvên Pêşyan, Gotinên Bav û Kalan, Metelokên Kurdî, Pendên Kurdî tê gotin. Gotinên Pêşyan di wêjeya kevin a devkî de cihekî girîng digrin. Ew berhemên kollektîf ên hezar salan in ku Dîrok, felsefe û sosyolojîya civatê ne. Bi zanebûna gotinên pêşyan mirov di derbarê çanda xwe ya kevin de serwest û

zana dibe. Di axaftinê de bikaranînên gotinên pêşiyar, axaftina mirov xurttir dike, dixemilîne û bandorê li ser guhdaran dihêle. (Ehmed Tîcrîs, Gotinên Pêşiyar, Weş. Rewşen, 2001 Gulan, r.3)

Eger beşên di yêr edebî hatibine piştguh kirin û kêmasiya berhevkarîya wan çê bûbe jî Gotinên Pêşiyar li gor wan di bin wê xetereyê de nemane çimkî gelekê wan hatine nûsîn û çap kirin. Kevnartirîn komelaya çapkirina Gotinên Pêşiyar di sala 1933an de bi navê "Qiseyê Pêşînan" van gotinanên pêşiyar bi aliyê "Îsmail Heqqî Şewîsî" dane berhev kirin, Di wê pirtûkê de 603 pendên pêşiyar hatibûne nivisîn ku li ser bingeha "Siyasî, Edebî, Civakî, Aborî, Komedi" hatine dabêş kirin. Piştî wê Marûf Ciyawok di sala 1938an de pirtûkeke bi navê "Hezarbêj û Pend" da çapkirin ku di nav pirtûkê de hezar pendên pêşiyên Kurdî bi tîpên "Hîcayî" hatibûne tomar kirin. Herwiha di kovara "Dengî Gêtî Taze", "Diyarî Kurdistan", "Diyarî Lawan" jî de nêzê 150 gotinên pêşiyar hatine çapkirin. Belam pirsgerêkek heye ku tevan jî van gotinan ji hev wergirtine. Herwiha "Pîremêrd" jî (6448) pendên pêşiyar bi awayekî helbestkî di rojnameya Jînê û Jîyanê de belav kiriye. Di kovara Gelawêjê de gelek pendên pêşiyar hatine çapkirin û belav kirin. Belam komelaya Mihemedî Xalî di vî warî de ji tevan gewretir û firehtir e. Ew jî bi tîpên "Epcedî" hatine nivisîn. (Aladîn Sûcadî, Mêjûy Edebî Kurdî, R: 141; Sidîq Borekey, Mêjûy Wêjey Kurdî, r.36-37)

Bi şêwaza zareveya kurmancîya jorî jî gelek pirtûkên pendî pêşiyar hatine çapkirin. Ji wan komeleyan: Komeleya Cegerxwîn sala 1957an li Şamê komek pendên pêşiyar çapkir, Li heleb fermandekî kevnê bi navê Cemîl Kenin komek pendên Kurdî wergerande li ser zimanê Erebî û belav kir herwiha zana û folklornasên welatê sovyetî gelek pendên pêşiyar çap kirin: wekî Heciyê Cindî, Casimê Celîl ji aliyekê din Qanatê Kurdo, Dr Margirêd Rodîtko komek ji pendên zimanê wergerandine li ser zimanê Rûsî. (Izedîn Mistefa Resûl, Lêkolînewey Edebî Foliklorî Kurdî, r.85)

Eger em berêxwe bideyn gotna pêşiyar ji hemu beşêndî yêr edrbî zêdetir kar li ser hatye kirin, lê mixabin heta niha li qada sînemayê derhênerên Kurd nikarîne sûd li wê berhema girnga adebî bibînin, ji bo sînyoyeka sînemay

ENCAM

1-Bi nîşandana wêneyên biraderên "Lomyer" ên li dû hev yek hatin di sala 1895, li vir ve dîroka sinemayê dest havêtîyê. Lê sînema zû pêşketiye. Wekî hemû çiqên wêjeyê sînema jî xwastiye pê bi 'Heyama Teknolojiyê' re biavêje. Ceribandinên xwe yên yekem jî sed sal berê niha da dest pêk hatîye.

2- George Mîlîes ê ku xwe bi nîşanadana filmên îlîzyonîst (Efsûnayî) dest bi çêkirina filman kir û kariyer pê çêkir wekî girîngtirîn derhênerê cîhanê tê nasîn, her wiha derhênerê ku herî zêde film (531) çêkiriye ye û kesê yekem e ku beşên edebiyatê anî nav sînemayê. Mîlîes yek ji derhênerê ku zêde sûdyê wî gêhijtiye sînemaya cîhanê ye. Her wiha Sînemaya ku ket nav lepên sermayeyê, rê vekir bo rekabetê. Her filma ku hate çêkirin li paş xwe pereyek ango sermayek dihişt, bo çêkirina filmeke nû. Bes ev rêç li her derî derbasdar nebûye. Mînak: Li Emrîka bo xema sermayeyê xem hate xwarin, Ewropayê jî xem ji hêla hunerê ve hate xwarin. Vê yekê jî li Ewropayê hêla sînemayê ya hunerê zêdetir da pêşxist.

3-Sînema "Erdnigariya Kurdistan" ê dema bi ya cîhanê re bê berawird kirin tiştê yekê a ku tê bîra mirov ev e: Bê welat e sînorên wê ne diyar in her wiha mirin" Ji filman kêmbûye. Li her çar perçeyên erdnigariya Kurdistanê ev meseleyên sosyolojîk û polîtîk di filman de hatine nîşandan. Kurdên ku girêdayê dewletên curbicur bûn ji hêla polîtîk û kulturî de di bin zexta wan dewletan de ma, û ev yek jî bû sedem ku Kurd li gor Ewropayê 50-60 salan dereng man bo vê çîqa hunerê.

4- Ger em bipejirînin û bibêjin her filmek ne "Fîlmeke Kurdî" ye, ev jî tê wê maneyê ku Kurd piştî demeke dirêj derbasê vê qadê bûne. Gelek filmên ku li ser kaxiz wekî sînemaya kurdî tên pênase kirin hene bes ne Kurdî ne çimkî bo filmek bibe fîlmeke kurdî divê, nîrxên çînî di xwe de bihewîne her wiha dive rastî û xerabiyên civakê nîşan bide. Di vê qadê de dest pêka sînemaya kurdî ku bo sînemaya Kurdî kesê herî girîng e Yılmaz Guneyî ye. Yılmaz Guneyî him bi naveroka filmên xwe ve him jî bi rêya qarakterên ku afirandin e ve kêşeyên civakê û hewl daye felesefeya heyata wan bi awayekî rasteqînî bide der.

5-Nîrxên ku him sînemaya cîhanî him jî sînemaya Kurdî jê sût ji edebiyat wergirt hema hema yek in. Di vê dema ku her diçe sênarîst û derhêner zêde dibin da: Nûsîna senaryoyan û çêkirina sînemayeke baş kêmbûye. Vê yekê jî ew neçar hiştin ku bo sinemayê wêjeyê bikar bînin û sînema bi vî awayî bû malê edebiyata nivîskî ango ya devkî. Ji bilî van wekî me li jor jî gotibû sînemaya Kurdî ji ber kêşeyên polîtîk û yên civakî naveroka filmên

xwe bi van kêşeyan hunand. Di vê qada sînemaya cîhanî de Yilmaz Guney, Key Bahar, Yeşîm Ustaoglu, Bahman Ghobadî, Jelay Janroy, Jano Rosebîanî, Samîl Rostamî, Mujde Arslan, û gelekên din di Dîroka Sînemaya Kurdî de kesên herî girîng in.

6- Nîrxên ku me him ji bo sînemaya cîhanî him jî bo sînemaya Kurdî digotin yek in ku ew jî sûd wergirtin ji deqên edebî bûn her çiqas bo sînemaya cîhanî xurt be jî bo sînemaya Kurdî derbasdar nîne. Çimkî sûd wergirtina ji deqên edebî di sînemaya Kurdî de ne di wê asta zêde de ne. Filmên bi wî rengî kêr in.

7- Tunebûna senaryonivîsan ango kêmasiya senaryonivîsên Kurd jî ji wan yekan e ku heta niha nikaribûne deqeke edebî bihunin û bikin filmeke sinemaya serkeftî.

8- Îro li her çar perçeyên Kurdistanê jî di derbarê sînemaya Kurdî de çavkanî tunebûn yan jî yên heyî jî qelsbûn. Ji ber vê yekê jî derhêner ango kesên ku dixwazin bi sînemayê re mijul bibin nedîşiyar zanyariyên baş di derbarê sînamayê de bigirtana ev yek jî dibû sedema çêkirina filmeke nebaş. Bes ev yek her diçe dişikê ango her diçe ev bobelat bi xebatên baş re winda dibe.

ÇAVOKANÎ

- Abdullah Saraç, (2007). **Berew Astane Ê Goşanîkirine**, Weş. Serdem, Hewler 2007, r.9.
- Abdurakîp Yusif, (1988). **Şarên Kklasîk Yên Kurdî**, Werger Li Tîpên Erebi .Elî Şêr, Çapa Yekemîn, Weş. Jîna Nu, Sweed 1988.
- Afreîm Lîsîg, **Gutihalit Dramatolojî**, Hamburg, Werger Azabarî, Weş. Fasilname Teksir, Hejmar 39, Tehran 1984, r. 33...39.
- Aladdîn Sicadî, **Mêjûy Edebî Kurdî**, Çapa Dûyemîn , Weş. Bilawkirdnewey Kurdistan, Sinindic 1989.
- Alain Morency, **Eqtibas El Edeb Fî El Sînema**, Werger Îdrîs Samîe, Weş. Camîa Abdulrehaman Mîre, Cezaiyr 1999, r.259-275.
- Alladîn Secadî, **Deqekanî Edebî**, Çapa Yekem, Weş. Koora Zanîayîya Kurd, Baxda 1978 .
- Andre Bazin, **Sinema Nedir?** Wer. İbrahim Şener, Weş. Doruk Yayınları, İstanbul, 2013, r.50.
- Bagnirîp Tedawîl, **Mêjiyê Edebiyata Cîhanî**, Werger Hêmin Kerîm Arif, Çapa Yekemîn, Weş. Rohhelat, Hewler, 2008 ,r.13.
- Balas Martîn, **Nezerîya Hay Rîvayet**, Werger Dr. Mihemmed Şahabe, İntîşar, Tehran 2012, r.50.
- Behzad Xoşalî, **Ziban Şînsî Tarîx û Kurdistan**, Çap. Fen Arwan, Hemedan 1979
- Berevan Ehmed, **Çîroka Foliklora Xurşîdê Çav Bi Xal Li Sînemayê De**, Govara Film, Weş. Rêveberya Sînemaya Silêmanî, Silêmanî Temuza 2010, Jimare 4, r.3.
- Bîr Mayo, **El Kîtabe El Sînemaiye**, Werger Dr. Kasim Migdad, Weş. Minşored Vezered El Seqefe-Muessese El Amme Lil Sînema, Dîmaşk 1997, r.139.
- Cemal Reşîd, **Lêkolîneweyekî Zimanewanî Derbarey Wilatî Kurdewarî**, Bê Çap, Weş. El Dar El Hurye , Bexda 1988.
- Çetoyê Zeydo-Yavuz Akkuzu, **Dîroka Şanoya Kurdî**, Çapa Yekemîn, Weş. Peywend, Stenbol 2015.

- Davîed Dicîz, **Şêwahayî Neqd Edebî**, Werger Mihemed Sibikyanî, Çapa Pencemîn, Weş. Îndîşar Elî, Tehran 2001, r.28.
- Edward Yalict, **Dîyana Dawî**, Roman û Pişewisîni Roman, Werger Ejî Goran, Weş. El Meşreq, Baxda 1982, r.9.
- Ehmed Tîcrîs, **Gotinên Pêşîyan**, Weş. Rewşen, 2001 Gulan, r. 3.
- Elî Germîyanî, **Çend Ciawazîyekî Miwan Roman û Çeşnekynî Dikey Edep**, Weş. Rubar û Newşefeq, Jimare 62, Tişrîna Dûyam, Hewler 2008 ,r.12.
- Feqî Hisin Sağînc, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, Çapa yekemîn ,Weş. Berdan Matbaacılık, Entîftîya Kurdî Ya Stenbolê 2002.
- Firaz Ebdûlcelîl El Şarut, **Delale El Sînema**, Çapa Yekem, Weş. Dar Nîbor, Iraq-Dîvanîye 2014, r.21 .
- Geoffrey Nowell-Simth, **Dünya Sinema Tarihi**, Werger Ahmet Fethi, Weş. Kabalcı Yayınevi, İstanbul, 2008 r. 28.
- Gîta Girkanî, **Mêjûy Sînema**, Werger. Sitar Kerîm, Weş. Serdem. Silêmanî 2002.
- Gorges Sadol, **Tarîx El Sinema El Alem**, Werger. D. Îbrahîm Geylanî, Çapa Yekemîn , Weş. Huryan, Beyrut 1965.
- Haşm Ehmedzade, **Opîs Ê Roman**, Werger Azazane Gundîyan, Weş. Perî ,Stenbol 2004, r. 190.
- Hoca Nesreddîn Tûisî, **Esas Îqîbas**, Werger Medresa Rezwa, Weş. Muesese İntişarat, Çap. Tehran Tehran 1961, r.62.
- Înca Karîtînkufa, Kîf Titim Kitab El Sînyaro, Werger Ehmed El Hizrî, Weş. El Heya Elama Lişiu Elmtabih El Emîrye, Mîsir 1999, r.11-15.
- Îzeddîn Mistefa Resûl, **Lêkolîneweî Edebî Foliklorî Kurdî**, Çapa Sêyemîn, Weş. Aras, Hewlêr 2010.
- Kawe Eweysî, **Îqîbasî Edebî Le Sînema Da**, Govarî Film, Weş. Rêvebeya Sînemayê Silêmanî, Silêmanî Temuzî 2010, Jimare 4, r.35.
- Kîndanisangir, **Fikrîl El Exrac El Sînemayî Keyf Tisbih Mixruca Ezîme**, Werger Ehmed Yûsîf, Çapa Yekemîn, Weş. El Hey El Emme Li Şion El Mutabih El Emîrye, El Kahîra, 2009.

- Lînda Sînger, **Filmname Îqtîbasî**, Çapa Yekemîn, Werger Abbas Ekberî, Weş. Întîşara Neqş Ê Nigar. Tehran 1980,r.33.
- Lodî Cantî ,**Fehmi Sînema El Edep**, Wer. Cefer Elî, Weş. Ayn, Marakîş 1993.
- Martîn El-sin , **Nimayîş Çist?** (Nergert Mîhemed Şihba) Çapa Yekemîn,Weş. Binyad Sînani Farabî, Tehran 1976, R,45.
- Maruf Xeznedar, **Belga Yekem**, Çapa yekemîn , Weş. Wezereta Perwedeyî, Hewler 2002 .
- Mihemmed Tofîk Werdî, **Belga Yekem**,Çapa Yekem,Bê Weş. Baxda 1968,r.19.
- Mihemmed Xeyrî, **Sînyaro**, Werger. Meshud Xalid Gulî ,Çapa Yekemîn, Weş. Xanê , Dihok 2007.
- Nazîr Ocak, **Edebiyata Kurdî**, Çapa Yekemîn, Weş. Sîtav, Wan 2016.
- Necm El Wanî, **Dîyorî Komannasî Wan**,Weş. Zaningeha Sileheddîn, Hewler 2017,r.10...15.
- Qeneta Kurdo, **Tarîxa Edebîyata Kurdî**, Werger Yekem, Weş. Roja Nu, Stockholm 1984.
- Raman Sîldin, **Rehnameyî Nezerî Mahasir**, Werger Abbas Mixbir,Weş. Întîşar Terihna,Terhan 1984, r.50.
- Remezhan Bernaw, **Edebiyata Kurdî Ya Gelerî**, Weş. Awesta, Stenbol 2015.r.249.
- Reza Elî Pûr, **Edebyat û Sînema**, Govara Film, Jimare 4 , Weş. Rêveberya Sînemayê Silêmanî ,Silêmanî Temûz 2010, r.20-21.
- Reza Elî Pûr,**Sînema Le Pêgey Hunerda**, Gowra Film, Jimare 1, Weş. Rêveberya Sînemaya Silêmanî, November 2009, r.19.
- Robert Coldwotêr-Marko Trîfis, **El Fen Vel Fenanun**, Werger Dr. Mistefa Hadî Conî, Metebeq Hey El Misrîye El Amme Lilkitab,El Eskenderîye 1997,r.41-42.
- Robert Mikkî, **Dastar, Saxtar,Sibik Ê Usul, Film Namanuîsî**, Werger Mihemed Gizîr Abadî, Çapa Dûyemîn, Weş. Hirmîz, Tehran 1985, r.25.
- Seid Şimî, **El Sure El Sînemaiye Min El Sînema Samte îla El Reqemye**, Çapa yekemîn, Weş. El Heye El Ame El Qisur Seqafye, El Qahîre,2013.
- Serger Kadir Şêx Mihemmed Haci, **Bunyeta Gêranevan Le Destanî ‘Mem Ê Zîn’î Ehmedî Xanê û Romanî’Şarî Mosîqara Sipîyekan’î** Bexityar Elî da,Çapa yekemîn, Weş. Aras, Dihok 2009.

Siddik Borekeyî(Sefilzade), **Mêjûyî Wêjey Kurdî**, Belge Yekem, Çapa Dûyem, Weş. Aras, Hewler 2008.

Sîmon Flîdman, **Sînaryo Rîvaî Sînaryo Wesaiqî**, Werger Ela Şinana, Weş. Muesese Amme Lil Sînema, Dîmeşq 2011, r. 17.

Taha Kerîmî, **Sînemafîk**, Çapa Yekem, Weş. Serdem, Slimanî 2013.

Tofîk Wehbî, **Asl U El-Ekred Ê Lugatum**, Wotar, Baxda 1956, r.9.

Ubeydûlay Ebû Bîsyân, **Çirîkey Mem û Zîn**, Kurdî-Farisî, Bê Çap, Tebrîz 1959 r.10

Cavkanyên Elektronîk

<https://didimn.com/sinemay-kurdi-tezlgay-chirok-culey-mirdu/> , Çêner Bedrî, D.G , 12/11/2017.

<http://www.milletpress.com/BirwraDetail> , Şaho Seîd. D.G , 16/01/2017.

<http://chawigal.com/archive/chaw.php?name=News&file=article&sid=361#.XE2cztszBIU> , Dana Mehemed Abullah, D.G, 2/3/2016.

<http://candname.com/sinema-kurdi-berxwedana-nermin/> Izedîn Salih1 , D.G , 2/6/2017.

<http://www.rudaw.net/NewsDetails.aspx?PageID=271634> , Senger Zirarî. D.G 30/12/2016.

Hevpeyvîn Li Gel

Piştîwan Abdullah (Sînemakar, Rexnegir û Nivîskarê Sînemayê), 2017 Hewlêr.

Şaxewan Mistefa (Sînemakar, Listikwan Ê Rêveberê Rêveberya Sînemaya Hewlêrê), 2018 Hewlêr.

Îbrahîm Remezan (Derhênerê Sînemayê Ê Master Li Sînemayê bi dumakîrye li welatê finsayê) 2017 Hewlêr.

ÖZGEÇMİŞ

Kişisel Bilgiler

Soyadı, Adı **Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN**
Uyruğu **Irak**
Doğum Tarihi ve Yeri **8.10.1986, Erbil, Irak**
Telefon **05342031565**
Faks **.....**
E-mail **acamabdulla@gmail.com**

Eğitim

Derece	Eğitim Birimi	Mezuniyet Tarihi
Yüksek Lisans	Van Yüzüncü Yıl Üni. Kürt Dili ve Kültürü	12 / 07 / 2019
Lisans	Selahaddin Üni. Kürt Dili ve Edebiyatı	2008-2009

İş Deneyimi

Yıl	Yer	Görev
2009	Kültür Bakanlığı	Sinema teknikerliği ve Yönetmenlik

Yabancı Dil

Türkçe	Orta Derece
İngilizce	İleri Derece
Arapça	İleri Derece
Farsça	Orta Derece

Filimleri

Geme – (Oyun -Game)
Firişte – (Melek – Angle)
Dayik – (Anne – Mom)

Hobiler

Sinema – Macera Turizmi – Dağ Sporlar-



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



18/07/2019

Tez Başlığı / Konusu

Tevkarîya Sînemaya Kurdî Ji bo Edebiyata Kurdî

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 57 sayfalık kısmına ilişkin, 22/08/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %3 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 3 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

22/08/2019

Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN
Adı Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Mohammed ABDULLAH ABDULRAHMAN
Öğrenci No : 15950001079
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

22/08/2019

ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR

22/08/2019
Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı